

**KT**

**Zanîngeha Mardîn Artkluyê**

**Enstîtuya Zimanên Zindî yê Li Tirkiyeyê**

**Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî**

**Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez**

**RÊJEYA BIKARANÎNA DENGAN DI DEVOKA DIHÊ DE**

**Süleyman KOÇAK**

**12721160**

**Şewirmend**

**Pwd. Hnk. Mikail BÜLBÜL**

**Mardin 2013**

## KURTE

Armanca vê xebatê tesbîtkirina rêjeya dengan ya devoka Dihê (Sert) ye. Ji bo tesbîtkirina dengan, çîrokên ku li wê herêmê tên vegotin hatine berhevkerin û ji wan hatiye îstîfade kirin. Piştî ku çîrok hatine qeydkirin û nivîsîn, ji dengê “a”yê heta dengê “z”yê rêjeya bikaranîna dengan hatine tesbîtkirin û bi awayekî îstatîstîkî hatine nîşandayîn.

Di vê xebatê de tesbîta rêjeya dengên bikirp û bêkirp ku ji herfên “a, ç, e, h, k, l, r, p, t, x” pêk tînin, hatiye kirin. Her wiha tesbîta rêjeya dengên serê peyvan jî hatiye kirin û bi îstatîstîkan hatiye nîşandayîn. Encamên rêjeya dengan ên van çîrokan, bi rêjeya giştî ya dengên kurmancî re hatine rûberkerin. Piştî rûberkirina rêjeya herêma Dihê û rêjeya giştî ya dengên kurmancî, dengên ku rêjeya wan nêzî hev û dûrî hev hatine nirxandin û şîrovekirin.

**Bêjeyên Sereke:** Kurmancî, deng, bikirp, bêkirp, rêje.

## ÖZET

Bu çalışmanın amacı Eruh ( Siirt ) ağız seslerinin oranlarının tespitidir. Seslerin tespiti için, bu yörede anlatılan masallar toplanmış ve bunlardan istifade edilmiştir. Masallar kaydedilip yazıldıktan sonra ‘a’ sesinden ‘z’ sesine kadar seslerin kullanılma oranları tespit edilmiş ve istatistiksel bir şekilde gösterilmişlerdir.

Bu çalışmada “a, ç, e, h, k, l, r, p, t, x” harflarından oluşan aksanlı ve aksansız seslerin oranlarının tespiti yapılmıştır. Bunun yanında seslerin kelime başındaki oranları da tespit edilmiş ve istatistiksel olarak gösterilmiştir. Bu masalların ses oranlarının sonuçları, kurmacî seslerin genel oranlarıyla karşılaştırılmıştır. Sonra Eruh yöresi oranları ve Kurmancî seslerin genel oranlarının karşılaştırması, oranları birbirine yakın ve uzak olan sesler değerlendirilmiş ve yorumlanmıştır.

**Anahtar kelimeler:** Kurmancî, ses, aksanlı, aksansız, rêje

## NAVEROK

<b>KURTE</b> .....	<b>II</b>
<b>ÖZET</b> .....	<b>III</b>
<b>NAVEROK</b> .....	<b>IV</b>
<b>PÊŞGOTIN</b> .....	<b>VII</b>
<b>KURTEBÊJE</b> .....	<b>IX</b>
<b>DESTPÊK</b> .....	<b>1</b>

## BEŞA YEKEMÎN

### 1. METNÊN XEBATÊ

<b>1.1. Çîroka Dianas</b> .....	<b>2</b>
<b>1.2. Çîroka Mîrza Miheme (Çîroka Hemama Xirabe)</b> .....	<b>11</b>
<b>1.3. Çîroka Keçeluk</b> .....	<b>15</b>

## BEŞA DUYEMÎN

### 1. LI GOR ÇÎROKAN TABLO Û GRAFÎKÊN RÊJEYA TÎPAN

<b>1.1 .Çîroka Dianas</b> .....	<b>24</b>
<b>1.1.1 Bi Alfabetîk di Çîroka Dianas de Jisedîtiyên Tîpan</b> .....	<b>24</b>
<b>1.1.2. Di Çîroka Dianas de Jisedîtiyên Dengên Bêkirp</b> .....	<b>25</b>
<b>1.1.3. Di Çîroka Dianas de Jisedîtiyên Dengên Bikirp</b> .....	<b>25</b>
<b>1.1.4. Tabloya Hejmar û Jisedîtiyên Tîpên Çîroka Dianas yên Bikirp û Bêkirp</b> .....	<b>26</b>
<b>1.1.5. Grafîka Hejmar û Jisedîtiyên Tîpên Çîroka Dianas yên Bikirp û Bêkirp</b> .....	<b>27</b>
<b>1.1.6. Tabloya Tevahî Hejmar û Jisedîtiyên Tîpên Çîroka Dianas</b> .....	<b>28</b>
<b>1.1.7. Nirxandina Çîroka Dianas</b> .....	<b>29</b>
<b>1.2.Çîroka Mîrza Miheme</b> .....	<b>30</b>
<b>1.2.1. Bi Alfabetîk di Çîroka Mîrza Miheme de Jisedîtiyên Tîpan</b> .....	<b>30</b>
<b>1.2.2. Di Çîroka Mîrza Miheme de Jisedîtiyên Dengên Bêkirp</b> .....	<b>31</b>

1.2.3. Di Çîroka Mîrza Miheme de Jisedîtiyên Dengên Bikirp .....	31
1.2.4. Tabloya Hejmar û Jisedîtiyên Tîpên Çîroka Mîrza Miheme yên Bikirp û Bêkirp... ..	32
1.2.5. Grafîka Hejmar û Jisedîtiyên Tîpên Çîroka Mîrza Miheme yên Bikirp û Bêkirp.....	33
1.2.6. Tabloya Tevahî Hejmar û Jisedîtiyên Tîpên Çîroka Mîrza Miheme.....	34
1.2.7. Nirxandina Çîroka Mîrza Miheme.....	35
<b>1.3. Çîroka Keçeluk.....</b>	<b>36</b>
1.3.1. Bi Alfabetîk di Çîroka Keçeluk de Jisedîtiyên Tîpan.....	36
1.3.2. Di Çîroka Keçeluk de Jisedîtiyên dengên bêkirp.....	37
1.3.3. Dî Çîroka Keçeluk de Jisedîtiyên Dengên Bikirp .....	37
1.3.4. Tabloya Hejmar û Jisedîtiyên Tîpên Çîroka Keçeluk yên Bikirp û Bêkirp .....	38
1.3.5. Grafîka Hejmar û Jisedîtiyên Tîpên Çîroka Keçeluk yên Bikirp û Bêkirp.....	39
1.3.6. Tabloya Hejmar û Jisedîtiyên Tîpên Çîroka Keçeluk.....	40
1.3.7. Nirxandina Çîroka Keçeluk.....	41
<b>1.4. Tabloya Giştî Hejmarên Tîpan li Gor Çîrokan.....</b>	<b>42</b>

## **2. TABLO Û GRAFÎKÊN GIŞTÎ**

<b>2.1. Grafîkên Tevahiya Alfabê.....</b>	<b>43</b>
2.1.1. Grafîka Jisedîtiya Tîpan Awaya Alfabetîk.....	43
2.1.2. Grafîka Tîpan a li Gor Rêzkirina Jisedîtiyê .....	44
2.1.3. Nirxandina Grafîkên Tevahiya Alfabê.....	45
<b>2.2. Grafîk û Tabloyên Dengên Bikirp û Bêkirp .....</b>	<b>46</b>
2.2.1. Grafîka Tevahî Dengên Bêkirp.....	46
2.2.2. Grafîka Tevahî Dengên Bikirp.....	46
2.2.3. Grafîka Tevahî Dengên Bikirp û Bêkirp 1.....	47
2.2.4. Grafîka Tevahî Dengên Bikirp û Bêkirp 2.....	47
2.2.5. Tabloya Tevahî Hejmar û Jisedîtiyên Tîpên Bikirp û Bêkirp.....	48
2.2.6. Grafîka Tevahî Hejmar û Jisedîtiyên Tîpên Bikirp û Bêkirp.....	49
2.2.7. Nirxandina Grafîk û Tabloyên Dengên Bikirp û Bêkirp.....	50
<b>2.3. Grafîk û Tabloyên Dengên Bikirp û Bêkirp yên li Gor Sêrê Bêjeyê.....</b>	<b>51</b>
2.3.1. Grafîka Hejmar û Rêjeya Tîpên Serê Bêjeyan yên Bikirp û Bêkirp.....	51

2.3.2. Tabloya Hejmar û Rêjeya Tîpên Serê Bêjeyan yên Bikirp û Bêkirp.....	52
2.3.3. Nirxandina Grafîk û Tabloyên Dengên Bikirp û Bêkirp yên li Gor Sêrê Bêjeyê.....	53
<b>2.4. Grafîka Tîpên Bêdeng û Bideng.....</b>	<b>54</b>
2.4.1 Grafîka Rêjeya Bêgeng û Bidenga.....	54
2.4.2. Nirxandina Grafîka Tîpên Bêdeng û Bideng.....	54

### **3. HEVBERÎ KIRINA VÊ XEBATÊ YA BARAN RIZGAR Û CELADET BEDIRXAN RE**

3.1 Grafîka Tîpan a li Gor Rêzkirina Jisedîtîyê ya vê Xebatê.....	55
3.2. Grafîka Tîpan a li Gor Rêzkirina Jisedîtîyê ya Xebata Baran Rizgar.....	56
3.3. Grafîka Tîpan a li Gor Rêzkirina Jisedîtîyê ya Xebata Celadet Bedirxan.....	57
3.4. Tabloya Alfabetîk Hevberî Kirina Giştî ya vê Xebatê, Xebata Baran Rizgar û Celadet Bedirxan.....	58
3.5. Grafîka Hevberî Kirina Tîpên Bikirp û Bêkirp a li Gor vê Xebatê û Xebata Baran Rizgar .....	59
3.6. Grafîka li Gor vê Xebatê Serê Bêjeye de Rêjeya Tîpan.....	60
3.7. Grafîka li Gor Celadet Bedirxan Serê Bêjeye de Rêjeya Tîpan.....	61
3.8. Tabloya Hevberî Kirina Hejmar û Jisedîtîyên Tîpên Serê Bêjeyê ya Xebata Celadet Bedirxan û vê Xebatê.....	62
3.9. Nirxandina hevberî kirina vê Xebatê ya Baran Rizgar û Celadet Bedirxan re.....	63
<b>ENCAM .....</b>	<b>64</b>
<b>PÊVEK.....</b>	<b>65</b>
<b>ÇAVKANÎ.....</b>	<b>66</b>

## PÊŞGOTIN

Armanca vê xebatê tesbîtkirina rêjeya dengên herêma Dihê (Sert) ye. Ji bo vê xebatê ji herêma Dihê çîrok hatine qeydkirin û nivîsîn. Piştî ku çîrok hatine qeydkirin û nivîsîn, ji dengê “a”yê heta dengê “z”yê rêjeya bikaranîna dengên hatine tesbîtkirin û bi awayekî îqtatîstîkî hatine nişandayîn. Encamên rêjeya dengên van çîrokan, bi rêjeya giştî ya dengên kurmancî re hatine rûberkirin. Di rûberkirina rêjeya dengên kurmancî yê giştî de, ji du xebatan hatiye îstîfade kirin. Xebata yekem a Emîr Celadet Bedirxan û Roger Lescot ye ku di berhema bi navê “Kürtçe Dilbilgisi (Kurmanci)” de cih girtiye. Xebata duyem jî ya Baran Rizgar ya bi navê “Kürtçe Dersleri / Dersên Kurdî” ye.

Weke ku tê zanîn, xebatên qadî di warê fonetîk û rêzimana kurmancî de pir kêr in. Girîngiya vê xebatê ew e ku bi qasî ku em zanin, berî niha tu kesî ji aliya tesbîtkirina rêjeya dengên herêma Dihê tu xebat nekiriye.

Di vê xebatê de tesbîta rêjeya dengên bikirp û bêkirp ku yê bikirp ji herfên “ç, e, h, k, l, r, p, t, x” pêk tînin, hatiye kirin. Her wiha tesbîta rêjeya dengên serê peyvan jî hatiye kirin û bi îstatîstîkan hatiye nişandayîn. Encamên rêjeya dengên van çîrokan, bi rêjeya giştî ya dengên kurmancî re hatine rûberkirin. Piştî rûberkirina rêjeya herêma Dihê û rêjeya giştî ya dengên kurmancî, dengên ku rêjeya wan nêzî hev û dûrî hev hatine nirxandin û şîrovekirin.

Ev çîrok di sala 2006an de ji aliyê Süleyman KOÇAK hatine berhev kirin. Vebêjêra van çîrokan Vecîde TALU ye ku ew bixwe ji bajarê Sêrtê, navçeya Dihê, ji gundê Hedîtê ye. Temenê wê 50e. Çîrokbêj, çîroka Keçeluk û Dianas ji diya diya xwe Şefîqe çîroka Mîrza Miheme ji diya bavê xwe Eyşe hîn bûye. Tu guherîn li ser çîrokan nehatiye kirin û çawa hatiye gotin wisa hatine nivîsîn. Di vê xebatê de ji sê çîrokan îstîfade hatiye kirin ku di wan de 11020 bêje û 42778 tîp hatine bikaranîn. Tîpên bikirp bi riya xêzkirina binê wan hatine nişandan.

Tez, ji destpêkê, du beş û encamê pêk tînin. Di destpêkê di derheqê xebatê de agahiyên giştî hatine dayîn. Di beşa yekem de metna çîrokan bi awayekî ku binê tîpên bikirp xêzkirî, hatine dayîn. Di beşa duyem de îstatîstîkên rêjeya bikaranîna dengên çîrokan ewilî çîrok çîrok, piştê bi giştî hatine dayîn û bi rêjeya giştî ya dengên kurmancî re hatine rûberkirin.

Ji bo şêwirmendî û alîkariya mamoste Mikail BULBUL gelekî spasîyê dikim. Her wiha spasdarî dayîka çîrokbêj Vecîde TALU me. Dîsa ji bo alîkariyên di xebatê de hevalê hêja Orhan SABAK û kekê xwe Hakan KOÇAK re spasdar im.

Süleyman KOÇAK

Mêrdin 2013

## KURTEBÊJE

**bnr.** : binhêrin

**g.** : grafik

**r.** : rûpel

**tev.** : tevahî

## DESTPÊK

Di vê xebatê de lêkolînek li ser denge bikirp û bêkirp hatiye kirin. Ev xebateke heremiye. Bersiva pirsên herema ku bûye mijara xebatê tîpên bikirp û bêkirp çi awayî hatine bi karanîn, rêje û hejmarên wan çine hatiye diyin. Rêje û hejmarên alfabeyê hemûyê xebatên wek emsal ya Celadet Bedirxan û ya Baran Rizgar re hatiye hevberî kirin.

Tîpên ku têde rengedeng hene ( p,ç,t,k ) hatine tesbît kirin. Awayê ku asta hişkbûna wan zêdeye yanî bêkirpin asayî hatine nivîsîn, yên ku asta hişbûna wan kême yanî bikirpin binê wan hatiye hîzkirin. Ji xeynî wan çar tîpên ji erebî derbasê kurdî bûne ( h ‘ح’, x ‘خ’, a- e ‘ع’) hatine diyar kirin. Digel wan ‘r’ ya lertzdayî û ‘l’ ya dirêj jî hatiye nîşandan. Tevahî li ser alfabê teybêtî li ser deh tîpên bikirp û bêkirp lêkolîn hatiye kirin.

Kesa çîrokbêj çîrok binav nekiriye. Xebatê de navê çîroka hatiye danîn. Di xebatê de ser sê çîrokan lêkolîn hatiye kiri. Çîroka Dianas ji 17966 tîpan pêk û 37 deqîqeye, çîroka Keçeluk ji 17080 tîpan pêk û 37 deqîqeye, çîroka Mîrza Miheme ji 7732 tîpan pêk û 15 deqîqeye.

Li gor rêzê; pêşiyê çîrok hatine nivîsîn pişt re ew tîpên ku nuansê wan hene hatine tesbît kirin. Yên ku bilêvkirinê de cudane binê wan hatiye hîzkirin. Hejmarên tîpên bikirp û bêkirp hatiye diyar kirin. Piştê li gor van hejmaran bi awaye tablo û grafikan hatine nîşandan. Çîrok bi çîrok ev kar hatiye kirin. Rêjeya tîpên bikirp û bêkirp di nav tevahî tîpên bikirp û bêkirp de cardîn di nava xwe de jî cuda cuda hatiye eşkere kirin. Li vê beşê de hin tîpên ku kurdî de kêmtên karanîn ku zêde derketibin pêş ji ber navê lehengê çîrokêye. Ev encam jî li beşa elegedar de berfireh hatiye dayîn.

Dîsa rêza rêjeya bikaranîna tîpan ya alfabetîk hatiye kirin. Ka gelo freqansa bikaranîna denge yê heremê çawane? Cardin rêjeya tîpên bideng û bêdeng çiyê?

Hejmara tîpan ya di serê peyvên de awayê tablo û grafika hatiye eşkere kirin. Armanc; peyvên kurdî kîjan tîpan destpêdikin û serê peyvêde kîjan zêde tîpên karanîn. Ev jî xebata Celadet Bedirxan re hatiye hevberî kirin. Lêbelê hejmara tîpên serê peyvê û hejmara pêyvên ne wek hev in. Sedema vê; ‘û’ yê gîhanek û ‘e’ ya cuda tê nivîsîn nehtiyê hesabkirin.

Xebatê de metin ne li gor rêzimanê li gor bilêvkirina kesa çavkanî hatine nivîsîn. Ji ber ku xebat ser bilêvkirîne.

Mêrdin 2013

## BEŞA YEKEMÎM

### 1. METNÊN XEBATÊ

#### 1.1. ÇÎROKA DIENAS

Carî cara bî rehmeî dî babê me hâzira bî, guhdara bî. Hey hebî hey tine bî kes ji xudê mezîr tine bî. Cariî bî go padişahiî bî, padişahê bajarî bî go heled veledê wî tine bî, ti zarokê wî tine bî. Navser bîbî ti zêdahîya wî tine bî. Go hin girgirê bajar yanî ewin piçî mezin der hatin balê gotin: Padişahê mi ne halê çênabê ti bê zarok î. Divê ti herî ji xwe re birênî derî, ba melakî, ser zîyaretî derî xudê teala zaroka bidê te zêdahîya te hebê. Sibe xudê nekê tiştî li te werê şûna te bigirin. Go de ka baş e wîleh xeberê hewe ye. Rabî ser xwe guhê xwe da wa û xurcezîna xwe tejiî tişt mişt kir û rê de xwarin marin der û hespê xwe siwar bî xwe pêk anî yalah. Berê xwe da oxirê piştî xwe da felekê çû. Go ez ê herim xeberê wa ye ez nemînim pê zêdahî. Çi bêjim rabî çû. Çû çû çû çû rê de go dewara sitûr mirad e. Çû ku dê, ku dê sekinî go ez ê ji xwe re vê dê pîrsîm. Rê de westaha, bî wextê mêja nivro liqayê kehnîkî hat. Go ez ê ser vê kehnîyê mêjîm, firavîne bixwum ez ê hênuka oxira xwe xêrêkim. Peyar bî hespê xwe wê dê ve girê da. Mêja xwe kir û firavîna xwe danî erdê, ser kehnîye firavîna xwe jî xwar. Go yalah ya xudê ez rabim herim. Dîsa qene siwar bibê hê siwar nebîyî rênî tehtîk ber kehnîyê de heye. Rênî ew teht bî di şext sûfik jê derket go paşayê mi selamûn aleykum. Go aleykûm selam. Aha! Go ti çi zanî ez paşa me. Go wextê ez nizamim ti paşayî nexwe îşê min vê dê çi ye? Go xêre ti ji ku ve tê yî, ê ti kuve herî. Go wextê ti zanî ez paşa me ti zanî ez ji kuve tîm ez ê kuve herim. Go ti derî ve neçe dermanê te ba min e ez ê rîya te kurt bibîrim. Libek sêv dayê. Go vê sêvê biqêşere qaşilê wê bide mehîna xwe -Go mehîna wî jî naza- û nivî de bêxe qet qetî bide xwe qetî bide jina xwe û êvara ênîye here nivêna jina xwe. Hey xudê hez kêbê ê xudê teala cêvî bidê te. Navê wa jî ez ê dênim. Navê yêkî Dienas bê yê dî Qedirnas bê. Ve navê wa jî mi danî lê yêk ji min re yêk ji te re. Go soz gava xudê teala da mi yêk ji mi re yêk ji te re, soz dan hev. Go tamam sêv dayê hat. Gava hat malê jina wî û mîletê hatin ba lê şîret lê kirîn gotin here. Hatin balê gotin paşayê mi ti çi zû hatî an ti poşman bi. Go na wîleh îşê mi hey xudê çêkir bê pêk hat, ez hatim. Go de ka xudê qeub bikê. Rabî ser xwe ew sêv qeşart, qaşilê wê dan mehîna xwe, sêv qet kir nivî wî xwar nivî da jina xwe û êvara ênîyê çû nivêna jina xwe. Mehîn wextê wê tamam bî xudê ceşîkî dayê û neh meh û neh rojê jina wî jî qedaha rabîlalemîn mirada wî pêk anî û di kur danê. Navê yêkî kir Dienas navê yêkî kir Qedirnas. Kurkin gew

maşilleh taze ne, spehî nin û vêca yêk ji yêkî hêj spehîtir e jî. Man, mezin bîn, pêşqênî bîn yanî dikarîna îş bikin hêdî. Paşayê gew sûfî ji bîr kirye. Dibêjê ji xwe hêdî nawê. Rojekî pencerê de ye paşa dirênê sûfîk ji wê ve tê. Halê lê dirênê lê dirênê çiqas tê berê xwe didê mala wî. Dikevê bîrê. Dibêjê xudê alime ew sûfîye mi soz dayî pê re sêv dayî mi ew sûfî ye. Dibêjê keçê keçê! Jina wî dibêjê çi ye? Dibêjê xudê ew sûfîye henê ê werê kurê me ji me bistênê, rabe here Dîenas xefke -Behsa yê taze dikê- hat kurê me ji me bistênê çimku mi pê re soz daye. Hema radibin ser xwe Dîenasê gew têxin pişt derîkîde derî lê mifte dikin. Sûfîyê gew tê dibêjê selamûn aleykum. Aleykûm selam. De were sûfîyê delal. Dibêjê paşayê mi ti çewanî? Paşa dibêjê ti saxbî ez baş im. Sûfî dibêjê ka zarokên me, çinkû dirênê yêk tenê wê dê ye. Dibêjê ka yê dî. Dibêjê xudê ev tenê daye me. Dibêjê de ka welê çenekin hewe soza xwe da ji soza xwe nequîbin. Ez zanim yêk di jî heye hema herin bînin verin ma hîn çîre xef dikin. -Pane kezebe dil nahêlin bidin- Dibêjin sûfîyê mi xudê ev tinê daye me. Sofî dibêjê de mi aciz nekî pişt wî derî de ye xudê. Ez nihû herim ez ê wî derî bişkênim jê derêxim. Vêca hema herin bînin werin. Paşa ditîrsê dibêjê xudê tîştî vî sûfîyî de heye. Radibin mecbur diçin tînin. Sûfî dibêjê çîre hin nerast dibêjin, ma ne te soz daye? Paşa dibêjê erê wîleh me soz daye me dil nehişt em bidî te. Sofî dibêjê ka lê birêne yê spehî jî xef kirine, ez ê vî bibim. Dibêjê ez hêdî babê vî me, ez ê qedrê wî bigirim, ez ê hajê mênim hewe ji xulpê tinebê, hîn ne dîbabê wî ne. Radibê Dîenas dibê. Sûfî dibêjê Dîenas? Dîenas dibêjê libê. Dibêjê ji vê pê de ez babê te me ê ti bêjî ji mi re babo, ez çi bêjim ê ti guhê xwe bidî mi ez yê te me ti dibabê xwe ji bîr bikî. Sûfî Dîenas dibê mala xwe û sîtkî tîne teji av dikê dêtênê ser agir. Agir didê bin û hinî gûz û mehîj Dîenas re tîne dêtênê ber dibêjê nehêle ev agir vemirê. Her agir bike û gûz û mehîjê xwe bixwe. Sûfîyê gew ji diçê hazîrîya xwe bikê û verê bixwê. -Yanî sûfî sêhre- Çûye didanê xwe tîjkê û werê Dîenasê gew bixwê. Dîenasê reben diçê her agir dikê, gûz û mehîjin xwe dixwê. Heta qederkî dimîne dirênê dengî tê dengê keçkî deng ji odê de tê lê ti kes naxweyê bismillah ev çi denge û ez kesî nabînim. Dibêjê ti kîyî, ti kudê de yî? Dibêjê Dîenas ka were ba vê sindoqê derê sindoqê veke bibîne. Radibê ser xwe diçê derê sindoqê vedikê dirênê keçkîye dest û lingê wê girêdayîye keçik dibêjê ka mi veke lê mi dernexe mi bêhêle tê de lê ez ê şîretkî li te kim. Ev sûfîyê he çûye xwe hazîr bikê ji tere didanê xwe tîjkê werê te bixwê ê te babêjê nav wê ava kelîde û te bipijênê bixwê ve şîreta te li te dikim gava hatê ê bêjê Dîenas vê avê dêne, bêje wîleh ez niqarime mi ti car îşê halê nekîrye ka ti hişne dêne ez bibînim qene ez jî guhê

xwe bidim te, çevê xwe bidim te bizanibim mu çewa çêdikê. Qe<sup>t</sup> ti dêneyne, ti destê xwe nede sîtilê. Go rasti? Go eywîleh ê werê te bikujê bikê nav avê de bikelînê bixwê. Keçik dibêjê dest û lingê mi veke û dîsa derî li mi dade deqene ez bikaribim werim te, ez jî werim alî te em ê wî bêxin tê de. Dienas dibêjê temam. Hema dest û lingê wê vedikê derîyê sindoqê digirê tê gûz û mehîjê xwe dixwê agirê xwe dikê dirênê sûfîyê gew tê. Dirênê av dibirbirê, dikelê. Dibêjê Dienas ka vê sîtilê dêne. Dibêjê babo ez zarokim mi ti car îşê halê nekiryê ez niqarim. Ka ti hilne dêne ka mu çewa hiltînê dêtênê ez ê jî guhê xwe bidim te, çêkim. Sûfî dibêjê aha halê hilne dêne pê tilya qulîçkê hiltînê dêtênê erdê çewa dêtênê erdê keçka gew ji wê sindoqê derdikevê çev dikê Dienas dibêjê em bêxin tê de. Çewa halê dêtênê erdê qene dîsa hildê dênê ser tifkê ew û keçî herdu çev dikin hev û serê wî hiltînin gurm dikin sîtilkê de. Keçik jî sêra wê heye lê wek ya sûfî ne serdeste. Çewa sûfîyê gew serkî dikin têde keçik xwe jî dikê kevokî Dienas jî dikê kevokî. -Pane ew jî sêhrke- Dibêjê Dienas em herin, difirin û diçin. Difirin difirin difirin diçin û diçin û diçin û diçin. Qonaxa di roja sê roja diçin keçik pêşîya Dienas e dibêjê Dienas ka şûn xwe birêne kes pê me nayê. Dienas şûn xwe ve dirênê dibêjê wîleh wek ewirkî reş pê me tê. Keçik dibêjê wîleh sûfîye. Dibêjê qey sûfî nemir, neşewitî? Dibêjê na wîleh sêhra wî heye neşewitîyê, leza xwe bike nekê me. Rojkî dî diçin dîsa dibêjê ka pişt xwe birêne dibêjê çiqas diçê nîzik dibê. Her diçin dibêjê ka pişt xwe birêne dibêjê ha ha bikê me. Keçik dibêjê wîleh em xilas nabî Dienas. Wê wextê liqayî baxçeyî paşakî tên. Kurê paşa jî nav bexçê de tê diçê. Dibêjê em xilas nabî keçik sêhre xwe û Dienas dikê di gulên sipehî xwe berdidin nav bexçe de. Kurê paşê diçê ber wa gula disekinê dibêjê hała hała kengê ev gulê henê bexçê mi de çebîne, çiqas ev gulê he sipehînin. Radibê diçênê tênê nîşa babê xwe wa bikê. Babê wî jî mal de ye diwana wî tejiye. Dehîncake diçê dikê babê xwe dibêjê babo ka birêne va gula. Paşa dibêjê kurê mi te jî kude anîne ev gulin he. Dibêjê wîleh bexçê me de bî. Hê ew ji babê xwe re dibêjê sûfîyê gew didê dehîncaka. -Pane zanê dît gula xwe berda bexçe- Dibêjê kurê paşê re ka wa gulên mi bide mi. Kurê paşê dibêjê ti kîyî, ti çi kesî, ti ji kuve têyî? Dibêjê ew gulê min in. Dibêjê ne gulê tene ti kîyî ne ez te nasnakim mi ji bexçê xwe çinîn. Dibêjê ne ew yê mi bîn. Dibêjê ne bexçe de çandî bîn kure yê te ne. Ew dibêjê yê min in ew dibêjê ez nadim te, ew dibêjê ê ti bidî mi ew dibêjê ez nadim te. Velhasil paşa dibêjê kurê mi bidîyê bidîyê bela wî serê wî mu jê diîrsê bidîyê bila bibê herê. Dibêjê na wîleh ez nadimî dibêjê bidîyê kurê mi ev sûfîye ez dibînim belaye, bidîyê bila herê. Vêca ew jî ji acizî qene halê

bidîyê dêrabar dikê qene halê bidîyê dirênê dibin di hinar destê de. Hinarê taze spehî dibêjê wîleh ez hinarê xwe nadim te dibêjê wa hinara bide mi dibêjê ez hinarê xwe nadim te. Dibêjê kuro ne ew çîçek bîn, bîn hinar. Dibêjê e hinarê xwe nadim te ew dibêjê tê bidî mi. Babê wî dibêjê bidîyê kurê mi guhê xwe bide mi bidîyê bela wî serê wî bila herê ji mala me. Ew jî açiz dibê hiltînê wê erdê didê hinara. Herdu hinara hiltînê wê erdê didê her libkê derkîve diçê. Ez çî bêjim serê te neîşênim axirkê Dienas û keçik xwe dikin herkî dendkî xwe dikin bin kevîya duşeka paşê. Paşa ser duşeka xwe runiştîye. Sûfî radibê dibê qup û çîçek dikevê ser wa dendikê hinara. Dibêjê nik nik nik nik veydidê. Vêca hêdî paşa û xulamên xwe dimînin şaş. Dibêjin ev çî tiştê ev nuhu sûfîbî eve bî qup û çîçek ev çewa çêbî. Sûfî dikevê wa dendika hemîya dixwê. Hêdîyûka keçik dibêjê Dienas! Dienas dibêjê çî ye? Dibêjê ê me jî bibîne em ilaçkî bikî. Dienas dibêjê em çî bikî? Keçik dibêjê em ê xwe bêxin di rûvî ti here çîçka ez ê herim qupê em libê nahêlî. Dibêjê wîleh başe. Paşayê gew hingê dirênê di rûvî ji bin duşeka wî derdikevin. Paşa dibêjê ha! ha! ev çibî vêca. Ew diçê çîçkê ew diçê qupê xilas dikin. Paşa hingê dirênê ew rûvî vêca dibin di insan. Keçkî kurkî herdu ji hev spehîtirin tişkî dur aqil. Dibêjê ev çibî ev çî mesele bî, hîn sêhr in, hîn cin in, hîn çin in? Dibêjin ha! mesele ev e. Dienas çewa babê wî çûyî ji xwere rênî ew ji babê wî standî. Keçî jî mesela xwe dibêjê. Dibêjin me herduka hêv divê ti xêra xwe me hev mehrkî radibê paşa jî di şahida tîne axirkê wa li wêdê hev mehr dikin. Paşayê gew ji ware xanîkî jî dibîne wa dikê têde wî gundî de dimînin. Sê çar zarokê wa çêdibin Dienas dimîne ser miemleşa xwe. Rojkî roja Dienas pencera xwede runiştîye dirênê durde dixweyê wî milê gund avkî welê spehîye welê bûşe xweşe pirik sere û vêca were xezala were heywanê kuvî. Teji heywanên kuvî ne veca ew heywanê spehî. Radibê dibêjê keçê. Jina wî dibêjê çî? Dibêjê ka wê çifta mi ji wêdê ve bide mi. Ez ê herim wa heywanin kuvî hinka bikujim bênim em ê bixwin –Pane jinik nas dikê zanê çiyê- Dibêjê Dienas ti guhê xwe bidî mi ti naçî. Dienas dibêjê ne we tejîne ka were lê birêne. Dibêjê ti guhê xwe bidî mi ti naçî heye sêhra sûfî xilas nebîbê. Dibêjê hermet me xwar çû . Dibêjê wîleh welê jî xilas nabê, neçe. Ez dibêjim sêhra wî ye wêdê. Dienas dibêjê ne tiştê welê tine. Jina wî dikê nakê guhê xwe nadîyê. Radibê ser xwe dest tavêjê çifta xwe. Jina wî dibêjê Dienas de here te guhê xwe neda mi ê ti pûşman bibî. Radibê diçê. Diçê lingê xwe tavêjê ser pirê hê lingê di neavêtî ser sûfîyê gew Dienas digirê ser serê xwere difitîlênê tavêjê ber xanîyê xwe de. –Ka mala wî nav çiyakî de ye kudê ye- Heşa sê çar roja hişê Dienas tê ser. Dirênê sûfîyê gew sere.

Dibêjê ha ev sûfiyê he çi tişt e. Sûfi dibêjê Dîenas. Dibêjê çiyê? Dibêjê ka rabe ser xwe. Radibê. Dibêjê te di te çi ji mi kir. Dîenas deyn nakê. Dibêjê were ez ji te re bêjim. Diçin ber tehtkî ve disekinin dibêjê Dîenas ez ê di tiştê bêjim ji te re yêkî hilde ji xwe re. Dibêjê de bêje. Dibêjê ev tehta he ê ji hev vebê tê herî tê de û ez ê seeta te bigirim seeta te tamam bibê ti derkevî tê derkevî ti dernekevî ez ê derê tehtê li te bigirim. Ti derkevî jî ez ê te bikujim ji xwe ti dernekevî ji xwe ê ti mênî tê de vêca ti keyfa xweyî te ji herdka kîjan bivê. Dibêjê tamam. Ez ketîme destê te de ti çi ji mi bikî ti keyfa xweyî. Radibê ser xwe pif dikê wê tehtê teht ji hev vedibê diçê tê de. Heta seeta wî tamam dibê. Dibêjê Dîenas. Dibêjê çiyê? Dibêjê tê derkevî? -Pane reh şêrîne.hema çewabê her seetê seetke e saxbim- Dibêjê wîleh e dernakevim. Dibêjê tamam tê de be heta ti bicihumî. Derê tehtê lê didê hev dimînê têhtê de. Teht jî wek şikeftkîye. Dimînê tê de Dîenasê gew rojkî di roja pêxwarin pêder. Halê wî namênê. Hingê dirênê kirt kirtkî tê. Dibêjê yarabbî ev kirt kirt kudê tê. Digerê digere dirênê qulêlik wek şikeftkîye diçê tê de. Dirênê were kelaşê insana tede, teji cendeğin, heywanim, mirîne wê erdene. Dibêjê wîleh hemî wî sûfi hal va kirye. Vêca ew cêhê sûfiyê. Carna diçê tê de. qutîk ya sûfi heye ew sêhrê wî hemî di wê qutîyê de ne ew qufî jî ka bîr kirye wêdê. Hema Dîenas radhêjê qutîyê dikê kurka xwede. Dimînê kurka de û ji bîr dikê. Hêca kirt kirt tê dirênê ruvîke cihê qulêla xwe vekirî tê ser wa hestîya têr dixwe dîsa derdikevê ser ruyê dinyayê. Dibêjê hey ev ruvîyê he mi xilaskê nexwe ez ji bin vêdê de xilas nabim. Vêca halê wî nemaye zeyif bîye ji nêza. Radibê hêdîka diçê ruvî ser hestîyaye dixwê hêdî hêdî hêdî diçê duvê ruvîre digirê. Ruvîyê gew li xwe didê. Duvê ruvî bernadê ruvî li xwe didê ev jî pê ruvî diçê. Carna qulêla ruvî mu rehet tê de diçê carna teng e carna fireh e. Carna reben zixirî diçê carna jî pîya diçê carna hestîye wî hev re diçin. -Pane qula ruvîye- Axirkê dê dê dê dê û welê ti dirênî ber kevîyîk ya tehtê re derdikevê Dîenasê gew ehnîya ruvî maçu dikê. Dibêjê de here oxira te ya xêrê bê. Te mi xilas kir. Dibêjê ez xwe bikênim rêkî qene hin mi bibînin e nemirim ji nêza. Hêdî hêdî xwe dikênê rêkî dirênê karwanî ji wê ve tê ne serîye ne binîye. Xweyê karwanê pêşîya karwanêye dibêjê bisekinin ji wî meyî neburing em vî meyî hildin hênuka herin. Dibêjin tamam. -Pane heçî karwanin her tişt wa re hene- Radibîn ser xwe hin ava wî germ dikin, hin sabuna wî hazir dikin axirkê xizmetê dikin, tînin deqene serê wî bişun û hilînin. Tînin ser mewşenê qene serê wî bişun. Dirênin dibêjin ji xweyê karwanê re paşayê mi heçku ev sax. Dibêjê ne saxe ya. Dibêjin bawerke saxe. Hêdîyûka destê xwe detînin ser vadin wî wadin wî dirênin saxe, nemirîye.

Mezinê wa dibêjê hebê tinebê ev ji nêza halelê hañye. Liqum tînin tînin ser devê wî çewa liqum dihelê piçkî ser deva dibêjê qurt qurtkî lê didê he piçû piçû dihelê her qurta lê didê. Axirê tiştî dikevê ber mida wî dikevê zîkê wî de. Piçkî çevê xwe ji hev vedikê. Dibêjin kuro ti kî yî, ti çi kesî? Dibêjê wîleh hal meselê mi eve ez ji nêza halêlê hañime ka piçî xwarin bidin mi e bixwim radibin xwarinê tînin -Pane her tişt heye- têr didinê hemdê wî tê sera hişê wî tê sera. Dibêjin tê kuve herî. Dibêjê hema ez jî rex hewe werim. Hîn kuve herin ez jî verim. Radibin wî jî kê heywankî siwar dikin. Dikevê rexê wa diçê. Ew jî diçin bajarê xwe ka kudê cêhê wa heye diçin wê derê derdikevin. -Pane îşê xwe zanin wê dê xan heye heçî misafirê ji derve tînin diçin wê dê. Diçin xanê de wê şêvê. Xan jî heqe ew jî nizanê reben Gava dikevin bajar de xwe ji wa winda dikê dikevê ber dikankî, disekinê disekinê zilamiç dibêjê ti vêdê çi dikî, qey ti xerîbî? Dibêjê e wîleh ez xerîbim. Kes tine nin mi xweykê îşev heça sibehî? Dibêjê ne heçî yên xerîb kes wa xwey nakê xan heye diçin xanê de û heqê xanê didin ka çend şêwa xanê de dimînin heça herin. Dibêjê kudê ye? Dibêjê wê da heye ecele bike here lêbelê merxêbê tê dadan. Ecele diçê diçê heça diçê dikîyê derê xanê tê girtin. Dibêjê ka mi jî bêxin tê de. Yê dergevan dibêjê wîleh derî haç girtin. Seeta wê heye deqqa derî haç girtin kes nikarê herê tê de. Dibêjê bextê xudê ez xerîbim e niza ez herim ku ez mam ji derve – Miletê wêdêyî ti kesî xwey nakê çinkû xan heye- Dibêjê e mam derve filan. Dibêjê wîleh xilas hêdî. Deqqa derî werê girtin nawê vekirin. Dibêjê nexwe ez çi bikim, ez mînim vê erdê, e çewa çêkim? Dibêjê ha we mezeli wê da heye. Here tê de lêbelê kê herê têde hêdî dernakevê. Dibêjê welê çewa ne. Dibêjê wîleh welêye heçî herê tê de dernakevê. Dibêjê wîleh ez ê herim tê de. Bila e dernekevim. E mînin derê malê jî ez ê bimirim, ez ê hişk bibim. Hema ez ê herim tê de. Radibê ser xwe diçê. -Zivîstane herhalde- Diçê ji xwe re çarşîye şûrkî dikirê dibêjê bila ev rex mi bê û çeqmekkî jî dikirê. Ez ê jî hêrim tê de ka xudê çi hes kirye? Qedera mi haçbê ji xwe ez ê bimirim qedera mi nehtîbê ez ê derkevim. Diçê tê de dirênê welê tari ye, zirûmaç e, hinavê mu diqetêhê tê de. Ew jî radibê ser xwe cilê xwe hemîya têxê û wa cila kom dêtênê qunçkî de û xwe jî têxê qunçkî de. Xewa wî nawê ji tîrsa, gofîyê tê bimirî tê de. Xewa wî nayê dimîne hişyar. Dimîne hişyar kêrka wî jî desta de. Hingê dirêne şeqî ya dîwar xira dibê. Dibê şeqt dêwkî heft serî jê dertkevê. Jê dertkevê îcar tê dibêjê çelep xwe nav cilê wî didê. Cilê wî tîkilhev dikê û tîkilhev dikê ew jî şûnve hema diçê hedîyûka dibêjê gurm nava herdû rayê pulê wî didê têxê erdê. Dêw Halê ser xwe re lê dirêne dibêjê derbkî dî jî li mi bide. Yêkîdî jî mi bide. Dibêjê na wîleh bes e

em ji mala yêkderbane bes e. Derbêkî zêde e te nadim. Wîleh wêdê xwe vedkutê heça dimirê. Paşê radibê ser xwe dibêjê ka ev cihê wî çî heye ka ez birênim. Radibê ser xwe diçê. Diçê dîwar bîye şeqt diçê tê de. Dirênê were zêra, were gustîlka, were seeta, were zîva xezneye cihê wî. Axirkê dibêjê malxane ev çîqa insan halê hatîn tê de her hal wa kirye tiştê wa birye. Radibê cilê xwe serbest wedgirê. Wî kelaşî jî derkî wada de dixirênê dibê derkî xef dikê. Hênu serbest radizê tê de. Dimînê heça derengê rojê ewên gotî here wê odê de raze lêbelê tê bimirî vêca bîra wa tê. Dibêjin kuro ne me şevîdî zilamiş rêkirbî vê odê ne nihu mirye tê de em ê herî bînî werî veşêrî. Nihu siftû bîye tê de. Dibêjin ey wîleh şevî dî zilamkî çûbî vêdê ka em herin binî werî veşêrî. Radibin diçin. Dîenas jî raza ye reben ew jî deng nakê dest tavêjinê dibêjin qey mirîye ji xwe. Tînin ser mevşen tazî dikin qene serê wî bişun. Pîyankî av pê de dikin. Dibêjê çip û radibê ser xwe. Dibêjê ev hîn saxa vedişêrin demek. Dibêjin bextê xudê. Xudê me nizanîya ti halê saxî. Ne kî çûyî wêdê de me şuştîye hilanîye. Mirîye. Kes vedê sax derneketîye. Ti çewa sax derketî. Hemî şaş dibin. Dibêjê wîleh ez ê herîm şikayeta hewe bikim. Hewe bidim girîtin. Hîn saxa vedişêrin, hin ne mirîya vedişêrin. Mi deyn nekîr bîya ê hewe ez veşêrama. Dibêjin bextê xudê ka te çî divê em ê bikî ti neçî şikayeta me nekî. Dibêjê divê hin vê odê û xanê ser mi çêkin heça e neçim şikayeta hewe nekim. Dibêjin tamam em ê bidî te. Radibin ser xwe xan û ode herduka ser çedikin, tapu dikin didinê. Ew jî deyn nakê dimînê wêdê de qaskî. Ti çî nabêjî ev xane, xanîyê paşê jî pêşmiqabile. Keçik paşê jî heye zehf spehîye. Radibê ser xwe Dîenasê min û te destê xwe tavêjê çakêtê xwe dirênê destê wî dikevê ew qufîya kurkê de. Dibêjê wey ev qufî mi ji wê şikeftê derêxist ev kêr çî tê. Xudê ez ê lê birênim ev qufîya çîye mi êxistîye kurka xwede û ji hingê ve mi destê xwe nedayîyê? Radibê dest tavêjê wê qufîye. Çewa qufîya gew vedikê dirênê çîl qîz, çîl keçî jê derdikevin çîl zêra tînin ser ranê wî û dikevin milê hev seyranê dikin. Dikevîn milê hev xêl dikin. Dîenas jî darî wa dikê. Xêl dikin Xêl dikin Xêl dikin keyfa wî tê ew jî diçê destê wa. Xêl dikin heça dişebikê. Dîenas dibêjê de bese vêca. Radibin ser xwe hemî dikevin wê qufîyê de Dîenas derê qufîyê lê didê hev. Dibêjê weh ev jî tiştî baş bî wîleh. Radibê ser xwe Dîenasê gew ti çî nabêjî hej keça paşê kirye, dîtîye keyfa wî jê re hatîye. Keça paşê jî hejê dikê. Îleh çevê wî lê ye. Ew jî kê rojkî roja diçê sukê qufîya xwe ji bîr dikê dihêlê malê. Keçî jî tê mala wî dirênê qufî wê erdê ye dest tavêjê qufîye. -Pane keça paşê jî ditîye xêl kirîn- Dibêjê ez jî vekim xêl bikim. Çewa keça paşê derê qufîyê vedkê dirênê çîl keçî jê dertkevin çîl şivik destê wa dene dikevin ser

keça paşê. Lê didin lê didin lê didin tê lê didin dikevin qutîya xwe de û qutî dinênê wê erdê. Keçka min û te dîn dibê. Keçka gew din dibê hêdî ne di<sup>kar</sup>in bigirin ne ti. Tê dirênê Dienas. Zanê ji wê qutîyê ye welêlê ha<sup>tî</sup>. Paşayê gew tê keçkê dibin hekîma di<sup>kin</sup> na<sup>kin</sup> sax nabê. Vêca Dienas dibêjê wileh ji vê qutîyê ye welê ha<sup>tî</sup>. Dibêjê paşayê mi. Dibêjê çiyê? Dibêjê ez ê keça hewe sax<sup>kim</sup>. Dibêjê te çî bivê malê dinyayê, te çî bivê ez ê bidim te. Dibêjê ez ê sax<sup>kim</sup> lê keçkê bidin mi. Mi tiştî navê tê keça xwe bidî mi. Dibêjê sozbê ti sax<sup>kî</sup> ez ê keça xwe bidim te û te çî bivê jî ez ê bidim te. Dibêjê de ka başe. Rabin ser xwe herin kes malê nemînin ez û wê tinê ma<sup>l</sup> de bîn enceq ez bi<sup>kar</sup>bim sax<sup>kim</sup>. Ew jî paşayê gew vezîrê xwe rê<sup>dkê</sup> serê bên dibêjê gundîya iro zîyafete herkes dave<sup>tî</sup>ye qene kes gund de nemînê. Gundî dibêjin xêr e îro paşa kir zîyafetê filan. -Pane mecbûr in- Radibin ser xwe herkes hazîrîya xwe di<sup>kê</sup> di<sup>çin</sup> zîyafetê. Di<sup>çin</sup> zîyafetê û Dienasê gew jî ew û keçî tinê mane ma<sup>l</sup> de radibê ser xwe di<sup>çê</sup> mala keçkê qutîyê jî dibê. Qutîya xwe vedikê çî<sup>l</sup> qîz jê derdikevin çî<sup>l</sup> zêra dêtînin ser rana dikevin milê hev xê<sup>l</sup> di<sup>kin</sup>. Keçî jî halê guhdarî wa di<sup>kê</sup>. Xê<sup>l</sup> di<sup>kin</sup> xê<sup>l</sup> di<sup>kin</sup> xê<sup>l</sup> di<sup>kin</sup> dişebikî<sup>n</sup>. Dienas jî radibê dikevê milê wa xê<sup>l</sup> di<sup>kin</sup>. Keçî jî dibêjê çip di<sup>çê</sup> dikevê milê wa. Ew jî xê<sup>l</sup> di<sup>kê</sup> û keçka min û te baş dibê. Keçkin gew tèn dikevin qutîya xwede derê qutîyê lê didê hev. Keçik axirkê wek berê lê tê. Dibêjê te mi divê? Dibêjê e wileh mi te divê. Dibêjê tamam ê babê te te bidê mi. Keçkê dihêlê mala wê tê. Heça babê wê tê dirênê keça wî wek berê ye. Dibêjê xudê wî zîlamî sax kir. Dibêjê wileh ez ê bidime mi soz daye pê re. Radibin ser xwe keça xwe didîyê. Keçik dimînê ba babê xwe. Sê çar zarok ji wê jinkê jî çedibin. Dienas dibêjê jina xwe keçê e bêjim babê te me divê em ji vêdê herî em aciz bîne ji vêdê ê bêjê qey keça mi xurtî dibê ne keyfa keça min e lê wextê ti bêjîyê belkî izna me bidê em ê ji vêdê herî. Dibêjê tamam. Ew jî radibê ser xwe dibêjê babo? Dibêjê çî ye? Dibêjê ti izna me bidî em ê ji vêdê herî, mala xwe bar bi<sup>kî</sup> herî. Em aciz bîne vêdê, em ê herî. Dibêjê hin keyfa xwe ne keça mi izna hewe destê hewe de. Radibê ser xwe ji ware dewara hazir di<sup>kê</sup> û der di<sup>kê</sup>. Cihazê wa, mala wa bar di<sup>kin</sup> wa rê<sup>dikin</sup>. Dibêjin oxira we ya xêrêbê. Tê tê ew gundê sûfî tê de dirênê sûfî ber vî berbankî runiştîye. Sûfî we zanê Dienas çûye, mirîye. Halê lê dirênê nas di<sup>kê</sup>. Dirênê Dienase. Sêhra wî jî tine tiştî bi<sup>kê</sup> qutî winda kirye. Dirênê jina wî ye zarokê wî ne û Dienase. Sûfîyê gew reş dibê, sor dibê, zer dibê qehra re dibêjê teq dîteqe. Dienas tê qene werê ba jina xwe ya ewilê. Jina wî zehf keyf xweş dibê. Dirênê jinkî dî anîye sê çar zarokê wî jî çebîne. Dibêjê Dienas te guhê xwe neda mi. Hewqa mi got te re te guhê xwe neda mi. Eve te dît, çî ji te

haṭ. Dibêjê e wiḷeh deyn neḷe, mi guhê xwe neda te çi haṭ serê mi. Dienasê gew jî navser bîye tê ba jina xwe ya dî dibêjê jê re keçê de rabe ser xwe em herî ba babê mi. Em herî serfîkî li wa bidî mi zuve wa nediṭîye mi bêhya wa kirye. Ka sax in mirî ne em herî ba wa. Radibê xweyê di jina çar pênc zaroka berê xwe didê babê xwe. Berê xwe didê dê babê xwe wa. Hê negahaṭî gund hin zarokê gundîya dibîne pîrsa dîya xwe babê xwe diḷê. Dibêjin qasê ti ji nav wa derketî dîya te babê te ew feqîr bîne, melîl bine, zelîl bîne, kor bîne. Hema mendîla xwe didê wa dibêjê ha ji hewe re bibin herin bidin dîya mi babê mi bila çevê xwe bidin ê baş bibê. Diçin dibêjin mizgînîya me li hewe Dienasê kurê hewe haṭ. Dibêjê neveyê erê go qey sax e? Dibêjin ha ji te re mendîla wî hîn bawer nekî goṭîye bila dîya mi babê mi çevê xwe bidin ê çevê wa ronahî bibê. Diçin mendîla wî digirin çewê xwe didin. Çevê herduka jî ronahî dibê. Diçin ba dibabê xwe û keyfa wa xweş dibê xwe tavêjin hev. Vê carê jî me te dît bes bî. Axirkê dimînin ba dibabê xwe wa. Cîroka me çû deştê dibabê me çûn bihiştê.

## 1.2. CÎROKA MÎRZA MIHEME ( CÎROKA HEMAMA XIRABE )

Carik cara bî rehmel dîbabê hazira bî yê me jî yê hewe jî milyaketên dora me jî hey he bî hey tine bî kes ji xudê meztîr tine bî meznê filha se bî derê mala me bî. Carik bî go gencik bî pê dîbab bî. Ti kesê wî tine bî ew tinê bî. Go ez genc im halê betal der kesê mi tine divê ez îşkî ji xwe re bikim, xwe xweykim halê çênabê. Ew jî radibê ser xwe dikevê rê diçê. Dibêjê ez ê herim ji xwe re îş. Dikevê rê diçê diçê diçê û bajarkî re derdikevê. Pîrsa mala paşê dikê. Dibêjê ez ê herim nuhû ew ê îşkî ji mi re bibînê. Radibê diçê pîrsa mala paşê dikê. Yêk jê re dibêje ve vêdêye. Eve mala wî. Diçê mala paşê –Pane xortkî delale, spehîye- Diçê xarê rutnê, dirênê civata paşê tejîye. Paşa dibêjê: Xortê delal de were vêda jorî. Dibêjê: Paşayê mi hema ez ê vêdêbim. Dibêjê: Wîleh zehf keyfa mi ji te re hat divê tî werî vêdê ber rexê mi. Tê, diçê jorê ber rexê paşê. Dibêjê: Tî kîyî, çi kesî, navê te çiyê? Dibêjê: Wîleh navê mi Mîrza Mihemeye ez jî vada ve teriqîme hatîme. Ez jî tineme, kesê mi tine. Ez jî hatîme ka ji xwere îşkî bibînim, ji xwe re îşkî bikim, xwe xweykim. Vêca tî ji mi re îşkî bibînî û bidî mi başê. Ew jî radibê ser xwe dibêjê: Nexwe ba mi be zehf keyfa mi ji tere hat, mi hej te kir xwina te mi kerizî ba mi be û hema tî çayê misafirê mi re binî bidî wa hîldî dênî, pêlavê wa rastkî û ezê miaşê te bidim te. Dibêjê: Belê ser serê xwe. Radibê ser xwe misafirê wî tene çayê ji wa re çedikê hitlînê dêtênê ber wa, pêlavê wa rast dikê îşê wî jî eve. Zehf keyfa paşê jê re hatîye, balêye, zehf hejê dikê. Rojkî roja Mîrza Mihemed ber pencerêye dirênê zilamke tepsîkî xwarin ser serê wîye ber pencera paşê re burand badikê hey hê kî bergeşa tîam tîam dibê hemama xirabe de. Mîrza Miheme dibêjê: Ev çi dibêjê paşayê mi? Dibêjê: Kurê mi bela xwe jê veke ew ne ti îşe kî ew bergeş birî hemama xirabe de sax derneketîye. Dibêjê: Temam. Guhe xwe didîye û diborê diçê ber pencerê re. Radibê ser xwe eynî wê roja dî ew bergeşa xwarinê ser serê wî zilamîye ber pencerê re diborê. Dibêjê: Hey hê kî vê bergeşê dibê hemama xirabe. Dîsa dibêjê: Paşayê mi tî izna mi bidî ez ê bibim herim. Dibêjê: Mîrza Miheme guhê xwe bide mi nebe. Nebe kî birî têde jê derneketîye dilê mi te veye, tî nabî. Dibêjê: Temam. Wê carê jî guhê xwe didîyê. Cara sisîya dîsa tê eynî ew zilame, ber wê pencerêre diborê. Badikê hey hê kî vê bergeşa xwarinê dibê hemama xirabe de. Wîleh Mîrza Miheme hêdî her ser mila de çû, divîya bibê. Go paşayê mi ez ê bibim herim. Paşa dibêjê: Nebe. Ew dibêjê: Ez ê bibim. Axirkê guhê xwe nadê paşê derî didê diçê. Diçê dibêjê: Ka bide mi ez ê bibim herim. Dibêjê: Ha ji te re bibe here. Didîye dibê diçê. –însanê herê têde mirî derdikevê nekû xirabeye ji xwe navê wê

kirne hemama xirabe. Hemamî zehf xweşe. Derî vedikê bergeşa xwarnê dêtênê ser wêdê. Dibêjê ev hemama he kudê xirabeye. Ew jî radibê ser xwe. Cilkê xwe têxê dibêjê ka ez tê serê xwe bişum. Radibê ser xwe. Xwe tazî dikê. Xwe dişû dişû dişû hemd û hişê xwe. Her tişt heye têde. Tê serê xwe dişû tê û çilkê xwe wedigirê. Rutnê ser wê xwarnê. -Pane her tiam wê bergeşê de heye- Ew jî rutnê ser xwarnê qene xwarnê bixwê û xwarna xwe jî ter dixwê. Radibê dest tavêjê bergeşê qene werê. Dirênê yekî -Pane kî çuyî têde derneketîye ew jî kerkî xwe re dibê. Dibêjê bila ba mi hebê- milê wî re girt. Dirênê destkî spî, spehîye halê lê dirênê kekçî welêye mu bixwê vexwê husn û cemala wê birênê. Dibêjê: Mîrza Miheme. Dibêjê: Çiye? Dibêjê: Birêne mi qedrê te girt. Dilê mi zehf teveye, mi zehf hej te kir lewma mi ti nekuştî. Heyne kî haî hirde û mi nehiştîye derkevê. Lêbelê ve mi hişt ti serê xwe bişu mi hişt ti xwarinê jî bixwî û hadê oxirbê ji tere. Lêbelê ti cardî newî têde. Ve mi tiştî li te nekir. Go hema halê hê xeberdana kekçê deva de, dibêjê req hema kerka xwe dertêxê vêda destê wê didê. Bîlezik destadeye kitê bîlezikê wê dibêjê fir diçê dera he û keçî winda dibê. Ew jî diçê dest tavêjê kitê bîlezikê wê derdikevê. Derdikevê tê diçê çewa paşa dibînê, paşa dimînê şaş. Dibêjê Mîrza Miheme! Dibêjê çi? Dibêjê: Aferim an ti zilamî tazeyî. Ti çewa derketî ji we hemamê. Dibêjê: Wîleh paşayê mi ve hal meselê mi eve. Dibêjê hîn bawer nekin ha ve kitê bîlezikê kekçê jî. Lê dirênê, dibêjê xudê rastê. Dibêjê Mîrza Miheme. Dibêjê çiye? Dibêjê: Ez çil roja izna te Didim, ti herî kitê havala vî bîlezikî ji mi re bînî. Dibêjê e çi bikim, xwelî neyarê xwe bikim, ez ê ji ku bînim kitê vî bîlezikî? Dibêjê tamam paşayê mi. Radibê ser xwe çil roja izna Mîrza Miheme didê. Mîrza Mihemeyê gew dikevê rê diçê. Diçê diçê diçê diçê ber avkî dirênê gemîke û ber kevîya avê sekinî, tejî insanin ne tê ne diçê dibêjê ha! ha! ha! Dibêjê wa zilama, dibêjê çire an hin navin an hin naçin hin peyar nabin? Dibêjê wîleh xortê dela! em niqarî herî. Hema em gemîyê dilepitênî em dirênî destî spî nav vê avê derdikevê dest tavêjê kevîya gemîyê qene qulbênê. Dibêjê ka kî rastêye, kudêre derdikevê? Dibêjê ha vê rasta here derdikevê. Ew jî dikevê têde kêrka xwe dikê destê xwe de. Dibêjê de bajû. Dîsa gemîya gew heraket dikê dirênin destî spî wê dêre derdikevê. Dest tavêjê kevîya gemîyê qulbênê. Ew jî dibêjê req he! xudê qewet didîyê lê didê. Bîlezik destadeye. Bîlezik dibêjê zip diçê wî milê avê. Diçê wî milê avê kekça gew winda dibê. Diçin wî milê avê dibêjin hey xudê ji te razîbê te me xilas kir ji vê tengîyê. Diçê dest tavêjê kitê bîlezikê di jî têxê kurka xwe de. Dibêjê her ve izna mi zehfe ez ê turkî bidim xwe, ez ê ji xwe re bigerim he! izna mi xilas bibê ez ê paşayê xwe

fitilim. Radibê diçê. Diçê diçê diçê cêhkî de dirênê jinkîke hema kuça dêtênê ser hev diçê xanî ji xwe re. Dibêjê wey Mîrza Miheme xer û silametî ti haî ser sera ser çava ne e te nas diçim ez û dîya te babê te em dostî û birayê hev bîn em havalê hev bîn e zehf hewe nas diçim. Ev ti ji kuve têtî xêr û silametî, filan. Dibêjê wîleh ez te nas nakim. Dibêjê ne ti kiçuk bî ti mi nas nakî lêbelê dîya te babê te me zehf havaletî hevre kirye em hev nas diçim. Dibêjê zehmet nebê ji te re ti werî ser piştî mi ez ê vî kuçî bidim te dêne ser diwêr. Destê mi nakîyê. Dibêjê estexfirilah ti were ser piştî mi e nawime ser piştî te ti were ser piştî mi ti dêne. Dibêjê tamam. Ew jî radibê ser xwe û xwe xwehr diçê Mîrza Mihemeyê gew. Jinika gew diçê ser piştî wî heça xudê qewet didîyê pêncutkî, pehînkî piştê didê. Dibêjê Mîrza Meheme heft tebeqe erdêde çû xarê. Dîsa dest avêt çeplê wî ser se rê xwere dizivirînê dizivirînê dizivirînê tavêjê ber qesra xwe de. Mîrza Mehemeyê gew dimînê ber wê qesrê de. Heça di sê roja hişê wî têt ser çevê xwe vedîkê dirênê ber qesrikê spîdeye. Dibêjê hey lo evê çî ji mi kir te dît? Wê çî hîla xwe mi kir. E çewa çêkim. Qesrikî spîye hêdîyûka diçê ber pencerê dirênê kes naxweyê. Ew jî li derî digere hêdîyûka diçê dirênê ti kes mal de tine. Qesrikî zehf xweşe, dere ew jî hema diçê xwe mal de xef diçê. Xwe derkî de xef diçê kes nebînê. Dirênê heça dibê şev sê keçî têt malde. Hersê xwêhkê hevin ji hevre dibêjin: Xwehê ka were îro me çî kirye. Ya hemama xirabe de ya nav avê de û ya Mîrza Miheme kirî bin erdê de hersê xwêhê hevin. Hersê jî sêhrin. Ya hemamê de dibêjê: Ez hemamkî xirabede bîm zehf çêhê mi xweş bî, mi nedihîştî kes werê têde. Gava yêk tehta têde mi sax dernetêxîştî mi wa diçûştî mi nedihîştî derkevin. Zehf çêhê mi xweş bî. Rojkî navê yêkî Mîrza Miheme -Mîrza Miheme jî guhê xwe didê wa- dilê mi zehf pêvebî haî têde mi hişt serê xwe bişu mi hişt xwarnê jî bixwe mi go bila pêbela herê mi nedivîya e biçûşim ji ku mi hejê diçira. Çû mi milê wî re girt mi go hêdî newe têde. Zehf keyfa mi ji te re tê mi navê e te biçujim here hêdî newe û mi hingê rênî dîtina mi dîtî şûrê xwe danî destê mi. Kitê bilezikê mi jî hey hîn bawer nakin nîşana wê. Ya nav avê re dibêjê xwêhê tiştî wî li te kirî mi jî kirye. Eynî ez jî nav avkîde bîn zehf çêhê mi xweş bî mi nahiştî kes ser wê avê re herê werê. Mi dest tavêştî gemîye diqulbanda avê de mi nedihîştî kes ser mi re herê. Eynî wel te kirye wel mi jî kirye. Eynî Mîrza Miheme dilê mi jî zef pêve bî mi zehf hejê diçira mi diçarîya ez biçujim jî mi nekuşt. Ewî wel mi jî kirye. Hin bawer nekin ve nîşana destê mi de jî. Xwêhka wa ya mezine wel Mîrza meheme kirî. Dibêjê hîn saxbin wîleh Mîrza Miheme xude zanê kuve çûye, mi kuştîye xudê zanê ka kudêye û mi zanîya wel hewe kirye

mi jî kê ewda hewe devê wî re derxistîye. Çewa welê gotê herdu xwêha xwe neavêtê!  
 Herdu xwêha xwe avêtê lêdan lêdan lêdan go bêje te çî jê kirye. Go wîleh mi avêtîye xudê  
 zanê kuve çûye, mi rêkir bin heft tebeqe erdê de û mi hîlanî disa ser serê xwe re zivirandîye  
 mi avêtîye xudê zanê ka kuve çûye. E nizamim. Go bêje ê ti derêxî. Tiştî li wî hatîbê em ê te  
bikujî. Lêdan lêdan lêdan. –Mîrza Miheme jî darî wa dikê- Axirkê ji ku lêdan xwêhka xwe  
 ber kuştinê ve anîn sep Mîrza Miheme. Gotin de welêbe. Go qey me nikarîya em bikujî te  
kuştîye. Mîrza Miheme rênî xwêka xwe ê bikujin hema pişt perdê dertkevê. Dibêjê ez kilê  
 çevê heve me ve ez vêdê me. Çewa Mîrza Miheme dibînin xwe tavêjinê dibêjin ti saxî,  
 maçu dikin. Dibêjin ti kure halê hatî vêdê. Dibêjê wîleh xwêha hewe mi ser serê xwere  
 avêt. Ez ber vê qesrê derketîbîm. Mi rênî hînê xwêhka xwe bikujin mi xwe eşkere kir.  
 Dibêjê ti çive hatî heta avê heta hal te hat. Dibêjê: Wîleh hal meselê paşê eve kitê bîlezikê  
 heve ve ez hatîme. Dibêjinê bîlezikê heyne deh bîlezik qurbana te bibin. Bîlezik çîye. Ew jî  
radibin ser xwe herdu keç dibêjin: Emê herdu rex te werî ti kuve herî em herdu ba tene. Lê  
 didin xwêhka xwe dikujin. Malê wa çî heyî hîldidin dikevin rê. Hertka jî xwe re tînê tê ba  
 paşê. Mîrza Mihemê gew tê hêca izna paşê dayîye heye. Dibêjê: Ti hatî hê rojên te hê izna  
te heyî. Dibêjê: E wîleh ez hatîm hem di jinave jî hem zêrê te xwestîve jî ez hatîm. Pa paşa  
 ji ku keyfa wî tê. Dibêjê: Wîleh Mîrza Miheme ti zîlamî yêkî hem ti herdu jinavejî hatî hem  
te bîlezik anî. Radibê ser xwe paşayê gew yêkî lê meh dikê yêkî jî kê kurê xwe meh dikê û  
 Mîrza Miheme jî dimînê ba paşê. Axirkê dibê wek malîyê wa. Çiroka me çû deştê dibabê  
 me çûn bihiştê.

### 1.3. ÇÎROKA KEÇELUK

Carik cara bî rehmell dî babê hazira bî, yê me jî yê hewe jî milyaketê dora me jî hey hebî hey tinebî kes ji xudê meztîr tîne bî meznê filha se bî derê mala mebî. Carik bî go yêk kurê pîrê hebî. Go navê wî jî keçeluk bî. Go zehf feqîrbîn nan tinebî bixwin. Go kurê wê go dadê. Go çiyê kurê mi? Go nan tîne em bixwî em zehf feqîrî ez ê herîm dara û bînim bibim herîm bifiroşîm ji xwe re bidî nan bînî bixwî. Go başe kurê mi. Go reben rabî ser xwe keçeluk diçê dara û barî dar dikê. Tîne tê dibê diçê sukê difiroşê. Didin nankî hey di nana û ew û dîya xwe ber tifka xwe rutnîn dixwine. Îşê keçelûk û dîya wî eve. Diçê sukê ji xwe re darê xwe difiroşê tînê ji xwe re didê nankî dixwin. Zehf feqîrîn û nan tîne bixwin. Go radibê ser xwe diçê barê darê xwe dikê û kerê xwe dikê tînê sukê. Tîne sukê difiroşê didê penc çerxîya deh çerxîya. Tînê de bidê nan ji xwe re. Dirênê zikak kî de ferxkî yê sêye û zarok lê didin lê didin. Ew jî ser wa disekinê dilê wî dimînê wî heywanîve. Dibêjê: Gunehe heywane berdin. Hîn çî re lê didin? Dibêjê: Ti welê xudan xêrî nexwe welê dilê te dimînê pêve pênc qurîşa bide me em ê berdî. Radibê dibêjê: Wileh ne ji xwe perê mi eve didê wa. Dibêjê: Vî heywanî berdin. Berdin bila herê. Ew jî radibin ser xwe berdidin. Ew jî tê mala xwe bêpere. Ew se jî dikevê pê keçeluk tê. Tê malê û keçeluk. Dîya wî dibêjê: Kurê mi ka te ji me re çî anîye, te nan anîye em birçînîn? Dibêjê: Dadê wilehî ve hal meselê mi eve. E hatîme û ferxkî yê sa destê zarokadebî lê didana mi go lê nedin gunehê û berdin bila herê heywane. Gotîne nexwe pera bide me pênc qurîşa bide me em ê berdî. Mi rabîye heqê darê xwe daye wa berdane û e şûn xwe ve dirênim seyê gew pê mine. E hatîme malê ew jî pê mi neqetaye ve pê mi hat malê. Dibêjê: Kurê mi ne nan tîne em bixwî em ê çî bidî heywana vêca. Ê heywan jî wey me mînê birçî. Go dadê de ka xudê ê qismetê wî jî bidê. Ew jî ber tifka xwe runiştine. Seyê va jî kê ba pêlava wêdê runiştîye. Ji halê xwe re, ji feqîrîya xwe re runiştine digirîn. Dibê sibeh roja dî dîsa keçelukê gew diçê dara. Dîsa barê darê xwe dikê dibê sukê difiroşê û perê xwe distênê tînê tê. Zikakê dîsa eynî wê rastê dirênê ferxkî yê kitkêye destê zaroka de lê didin. Dibêjê: Yarebî ev çewa çêdibê, îro di kit roje halê ev heywanên he liqayê mi tên. Dîsa dilê wî dimîne pêve dibêjê: Zaroknu de rebene berdin. Hîn çî re wê ferxka kitkê didin. Berdin bila herê. Dibêjin ti welê xudan xêrî nexwe pera bide me em ê berdî. Radibê ser xwe çî perê wî balê heyî heqê darê wî ew jî didê wa û pişika gew jî dibêjê: Nav nav nav heta pê tê mala wî. Dîya wî dibêjê: Kurê mi ka te nanî ji me re tiştî em bixwin? Em birçînî. Dibêjê: Dadê wileh ve hal mesele eve îro jî ve halê çêbî ve fexkê

kitkê jî pê mi ket hat. Dibêjê: Kurê mi de ka tiştî tine em bixwî em ê çî bidî va heywana ev ê jî wey me birçî mînin. Dibêjê: Dadê de ka ê xudê qismetê wa jî bidê. Mişk mala me de hene ê bigirê bixwê têra xwe. Dibêjê: Ê ew mişka bixwê ê se çî bixwê? Dibêjê: Deka ê xudê qismetê wa bidê. Ew jî diçê ba se rutnê. Dîya wî jî kê radibê ser xwe dibêjê: Xudê em birçîne îro di roje îdara me nabê ezê herim mala paşê ka ez hin nan naynim, em naxwî. Radibê ser xwe dikevê rê diçê mala paşê. Dibêjê: Pîreka wî xudê ji hewe razîbê hîn hinî nan bidî me, em birçînin. Em bibî herî bixwî şîva xwe. Ew jî radibê hinî nan man -Pane paşaye heye- didîyê. Dibe diçê. Dibêjê: Kurê mi wîleh eve mi hinî nan ji mala paşê anîye. Ev man manê hişk daye mi emê bixwî. Dibêjê: Başê dadê îro em îdare bikî heşa sibe ez herim dara. Ew jî radibê ser xwe dîsa sibehî dest tavêjê kerkukê xwe werîsukê xwe dîsa diçê dara. Diçê dara barî darê xwe dikê. Diçê sukê difiroşê deh banqenoşa û tîne dîsa eynî wê rastê ferxkî yê mara destê zaroka deye pê dileyzin û welê perîşan dikin. Destê xwe de lê didin der dikin. Radibê ser xwe dîsa dibêjê: Yarebî ev çewa çedibê ev her roj ev heywanin he destê va zaroka de. Dîsa dibêjê: Wa berdin gunehê ev heywan. Hîn çire lê didin? Dibêjê: Welê dilê te dimînê pêve nexwe pera bide me emê berdî. Radibê ser xwe dîsa wî perê heqê darê xwe didê wa dîsa berdidin. Marê gew jî pê dikişê tê mala wî ew jî. Dibin sê heywan. Tê ba wê kitkê û sê ew jî eynî wê dê disekinê. Ew jî radibê ser xwe dîsa dîya wî dierînê, digirî digirî dibêjê: Kurê mi ti çî re ha dikî te ev her sê heywanên he jî anîn vêdê. Gunhê wa bikevê stuwê me tiştî tine em bidî wa. Dibêjê: De ka dadê ê xudê qismetê wa jî bidê. Dîsa dîya wî diçê mala paşê hinî nan manê qet meş hişk mişk tîne. Pê xwarîna xwe dixwine. Axirkê welê rojî roja dirênê ew dîya xwe ber tifkê runiştîne û ji feqîrîya xwere ji halê xwe re digirîne herdu. Rebilâlemînê mezin dev û ezman didê mar. Ezman didîyê xudê, dibêjê: Keçelu. Dibêjê: Ev deng ji kî tê mala me de? Dirênê. Dibêjê: Ez marim, marê te mi anî te ji destê wa zaroka mi derêxistî ez im xeberdidim. Rabe ser xwe halê te ne ti hale. Ti zehf feqîrî duruma hewe dirênim hîn zehf feqîrin. Rabe û bikeve pê mi em herî mala babê mi. Em herî babê mi mîrê maraye. Babê mi zehf zengîne. Rabe ser xwe ez winda bîbîm wa zaroka mi dîtîbî. Hey te mi ji nav lepê wa dernexîsta ê mi bikuştana. Rabe em herî mala babê mi. Ti here pêşîyê bêje mizgînîya mi te, mi keça te dîtîye. Ê bêjê malê dinyayê bixwaze. Dilê wî zehf mi vebî, zehf hej mi dikira. Bêje mi ti malê dinyayê navê. Çiqas bêjê te malê dinyayê bixwazê bêje mi malê dinyayê hîç navê. Hey ti wê gustîlka destê xwede bidî mi bide hey ti nedî mi, mi navê. Mi ti tişt malê dinyayê navê. Dibêjê: Temam. Ew jî radibê ser xwe

dikevin pê hev diçin. Diçin diçin -Pane keçî mala babê xwe nas dikê û keçeluk nas nakê-  
diçin nîzik dibin mala babê wî. Dibêjê: Ez ê vêdê sekinim tî here ha ew xanîye mala babê  
mi ne. Mizgînîyê bidîyê bêje ve mi keça te dîtîye. Dibêjê: Temam. Ew jî radibê xwe xef  
dikê wêdê. Keçeluk lê didê diçê. Keçeluk diçê derî vetkê dirênê odeke teji marin. Markî  
mezine ser wî texfî mexel hatîye. Meznê wa ye, mîrê maraye. Halê derî vetkê dibêjîye:  
Were were. Dibêjê: Wileh ez nikarim werim ez ê çewa werim ba te. Dibêjê: Hema xwe  
bide nav wa were ba mi. Mîrê mara dibêjê: Mara xwe bidin alîkî bila werê ba mi. Dibêjê:  
Xêre te çi divê? Dibêjê: Wileh mizgînîya mi lî te mi keça te dîtîye mi anîye ji te re. Ji k  
u keyfa wî tê, ji ku bêhya keça xwe kiryê. Dibêjê: Te kudê dîtîye? Dibêjê: Wileh ve hal  
mesele eve destê zaroqa de mi derêxistîye. Dibêjê: kanî? Dibêjê: Ve ew jî tê. Dibêjê: Navê  
te çîye? Dibêjê: Navê mi keçele. Dibêjê: Keçel de vêca malê dinyayê bixwaze. Mi soz daye  
kî keça mi bibînê bînê bidê mi malê dîyayê çiqas bivê ez ê bidimê. E zehf zengînim.  
Dibêjê: Wileh mi ti tîşt navê, dikê nakê. Dibêjê: Mi ti tîşt navê mi gustîlka destê te de divê.  
Ew jî dimînê şaş! Dibêjê: Yarebî. Dilê xwe de dibêjê: Xwezî te ev nexwesta lê mi soz daye.  
Mi gotîye kî keça mi bînê çi bivê ez ê bidimê. Ev felê keça minin gotî ji te re. Hey nexwe t  
çi ji gustîlkê fêhm dikî. Dibêjê: Lê mi soz daye ez ê bidim te. Radibê gustîlka xwe dertêxê  
didîyê dirênê keça wî jî tê. Keça wî jî, keyfa wa xweş dibê. Xatira ji hev dixwazin. Dibêjê:  
De here vêca feqîrîya te xilas. Ew jî radibê tê. Tê nivê rê dirênê gustîlkî. Dibêjê: Weyla mi  
xwelî serê xwe kirî hewqa malê dinyayê goşe ezê bidim te mi go mi navê mi guhê xwe da  
keça wî deka vêca ez ê çi ji vê gustîlkê bikim heşa êvarî destê mi de ê çi feydê bidê mi. Ê  
zikê mi çi têrkê. Ew jî radibê halê pê dîleyzê. Destê xwe de ba didê dirênê di efrîdê cina ber  
hazir dibin. Dibêjin: Keçel em dinyayê avabîkî an xirabîkî? Dibêjê: Ne dinyayê xirakin ne  
avaşin herin çêhê xwe de runin heşa hin lazim bin ez ê bakim hewe. Ew jî radibin winda  
dibin. Dibêjê: Wileh ev xudê da mi. Tê malê dibêjê: Dadê. Dibêjê: çîye? Dibêjê: Dadê  
wileh xudê da me. Dibêjê: Çîye kurê mi, çi xudê dame? Dibêjê: Te ji xulpê tinebê. Dibêjê:  
Rabe tî îşev herî keça paşê ji mi re bixwazî. Dibêjê: Weyla evdalê. Dibêjê: Dadê ka tî rune.  
Dibêjê: Wileh mi ne bawere. Dibêjê: Belê belê ka tî rune. Radibin ser xwe rutnin. Gustîlka  
xwe ba didê di efrîdê cina ber hazir dibin. Dibêjin: Keçel em dinyayê avabîkî an xirabîkî?  
Dibêjê: Ne dinyayê xirakin ne avakin. Bergeşî xwarin ji me re hazirke. Bîne dêne ber min û  
dîya mi hemî tiam tê de hebin. Radibê ser xwe wê qederîde bergeşkî çiqas tiam heyîn têxê  
bergeşêde tînê tênê ber wa. Vêca pîrê tî car tîştê welê nedîtî, keyfa difirê. Dikevin ser

xwarnê tê dixwin. Dibêjê: Kurê mi em ê çî ji vê xwarnê bikî? Dibêjê: Dadê te ji xul xwarnê tinebê em ê bakî wa bila werin çî jê dikin bila bikin. Ew jî radibê dîsa gustîlka xwe ba didê di efrîdê cina ber hazir dibin. Dibêjê: Vê bergeşê hîldin bibin herin. Rabdin dibin diçin. Dibêjê: Dadê hêdî ti tengîya me nema û xudê li me kir. Heywanê xwe jî têr dikin te jî ber wa xwarin dikin. Wê şêvê dibêjê: Dadê. Dibêjê: Çiye? Dibêjê: Sibehî divê ti herî keça paşê ji mi re bixwazî. Dibêjê: Kurê mi ma halê çewaye? Rebeno ê keça paşê bidin te. Dibêjê: Çewa ez ê herîm bixwazim, ez ê çî rukey herîm bixwazim? Ne nan tine em bixwî. Dibêjê: Ne dadê hêdî em zengîn bîn ê bidin me. -Pane paşa şertê wî hene gotîye şertê mi kî pêk bîne ezê keça xwe bidim wî- Dîya wî xwe re nabîne herê xortî retkê. Xortî retkê, çewa diçê jina paşê dibêjê qey haşîne hinî nan ji xwe re hema hinî nan didîyê tîne tê. Fêhê dikê hêdî xeber bidê nanê xwe tîne tê. Dibêjê: Dadê te got? Dibêjê: Na wîleh kurê mi ez çum we zanîna ez haşîme nê hema cêhde nan dan mi. Mi fêhê kir bêjim, e fitîlme. Neqladî diçê dîsa welê. Dîsa nan didîne fitîlê. Neqla sisîya hêdî dibêjê: Vê carê ti ruyê xwe qayîm bikî ti herî îcar ser textê xazgînîya runî. Ti hîç nan hîlneynî nevî. Dibêjê: Temam. Radibê ser xwe û hema îcar diçê ser textê xazgînîya rutnê. Dibêjê: Xêre pîrê, ev vêdê çihê te qey, xêre ti vêdê runîştî? Dibêjê: Wîleh haşîmê dewa mirovatîya hewe bikim. Dibêjê: Ji kî re? Dibêjê: Keçelê mi re. Dibêjê: Weh! Çewa çêbî hîne çewa çêkin, hinê pê çî bibin? Ne şertê me hene. Vêca keçel û keça mi. Go wîleh ve mi rêkirye. Go temam. Mane nan tîne hîn bixwin. Dibêjê: Wîleh ve mi rêkirye. Go temam mi soz daye kî şertê mi pêk bîne ez ê bidim wî. Dibêjê: Ka paşayê mi şertê xwe bêje ez ê jê re bêjim. Dibêjê: Temam. Radibê ser xwe dibêjê: Şertê mi; ve heft sale hespîk yê mi ser hevsanê piştêye ve heft sale nexweş divê ez sibehî rabim ew sipûsax bîbê. Ez sibehî rabim heft suwar hepsê xwe ve kurîma wa reş, cilê wa reş, hepsê wa reş, û barê zêrave derê mala mi bin. Ez sibehî rabim mala mi heft mala te hemî kuçê memerkîrî û hemî dorê tîam çêbî pêve haşî û xanîyê te jî wek eynî yêk mu ne ji yê mi kêmtîr. Eve ev jî sê şertê mi evê hene. Kî pêk bîne mi soz daye ez keça xwe bidim wî bila kîbê. Dibêjê: Belê. Radibê diçê. Dibêjê: Keçeluk kurê mi wîleh ve haşî meselê paşê eve şertê wî evin. Dibêjê: Temam dadê rehetê. Ew ba mi rehetê. Radibê nivê şêvê gustîlka xwe ba didê di efrîdê cina ber hazir dibin. Dibêjin keçel em dinyayê xirabîkî an ava bikî. Dibêjê: Ne dinyayê xirakin ne avakin. Eyni gotîna paşê çî gotî wê pîk bînin sibehî. Dibêjin ser serê xwe. Temam radibin ser xwe. Paşayê gew jî hewqa tîne keça wî hewqa tîne keça wî pane ti kes nikarê wa şerta pêk bîne. Ew jî dibêjê: Ma ê keçelê pîs pêk bîne, ew ji xwe hîç nikarê

pêk bînê. Paşa jî hîç ne bira wî deye jî. Paşa sibehî radibê desmêjê dirênê hîr hîra hespê wîye malde û hîr hîra wî diçê hey diçê. Ji ku baş bîye, ji ku wey berê haîye qadir heye derî pencera bişkênê derkevê hewqa baş bîye. Dibêjê: Weh! Ev dengê hespê mi ne. Radibê dertkevê dirênê heft hepsê reş, çilê wa reş, rîma wa reş û barê zêrave derê mala wî girêdayîne bexçê wî de. Lê dirêne dimînê şaş paşayê gew. Dibêjê: Keçel û vî îşî? Diçê dirênê eynî gotîna gotî ji derê mala wî heşa derê mala wî hemî kuçê mermer, hemî tîam welê wey havîne hemî pêve haîin spehî, taze û livankîrî. Xanîyê wî eynî tîpa xanîyê wî de eynî yêk wey xanîyê wî wêde jî çêkirî. Siphaniyah! ev keçelê he bî çî, ev çî kirye vî keçelî? Wîleh keçelbê, gavanbê, şivanbê ez ê keça xwe bidimê. Dibêjê: Hermet. Dibêjê: çiyê? Dibêjê: Xudê vî keçelî şertê mi pêk anîn. Divê em keça xwe bidînê. Jina wî dibêjê: Paşayê mi deka em ê çewa keça xwe bidî wî keçelî. Dibêjê: Ne ve hewqa insan haîin nikarîna şertê mi pêk bînin ve wî şertê mi pêk anîye. Mi jî soz daye kî şertê mi pêk bînê e bidim wî divê e bidimê. Keçelbê çibê. Radibê ser xwe pêk tînin dixemlînin der radibin didînê. Didin keçelê min û te. Dibê diçê keça paşê. Ew jî radibê ser xwe mala wî xweşe halê wî xweşe û keyf keyfa kecele. Ne îş û ne emel hêdî dikê, nakê. Ew jî radibê ser xwe rojkî roja keçelê gew bêhna wî teng dibê. Dibêjê: Ez ê herîm nêçîrê. Bêhna mi teng bîye malê. Ez ê ji xwe re herîm nêçîrê. Dirênê gustîlî desta dê. Dibêjê: Gustîlka mi heyfe ê bikevê ê wînda bibê. Hema ji destê xwe dertêxê û tavêjê wêdê. Dibêjê: Hema bila vêdêbê heşa e zivîrîm. Gustîlkin mistîlkin, hêsînin tavêjê nav wade diçê. Diçê nêçîrê. Cihukî jî wî gundî de heye ew jî ji qestî tê wêde etarîyê. Tîne tîştî difiroşê. Jina wî jî -Keça paşê- dibêjê: Wîleh ev demirin û tîş miştin vê erdê çine ser çevê me ez ê bibim herîm bidim etar. Herîm bidim etar ez ê tîşkî ji xwe re ji berve bînim. Ew jî radibê ser xwe hemîya didê hev gustîlî jî navdeye. Gustîlî jî nav wa demira deye hemîya didê hev dibê diçê didê etar, difiroşê. -Pane cihu zanê gustîlka efrîdê cinaye, gustîlkê nas dikê- Jina wî dirênê gustîlî jî navdeye le nizanê ew gustîlî hewqa mihume dere dîyare. Dibêjê: Ka wê gustîlkê ya mêrê mine e nadim te. Çewa wele dibêjê cihu baş fêhm dikê ya efrîdê cinaye. Dibêjê: E vê gustîlkê nadim te ha ji tere va demirê he. Dibêjê: Wîleh tî wê gustîlkê nedî ez va jî nakirim. Tî vê gustîlkê bidî ez ê zehf tîştî bidim te. Dibêjê: Temam. Ew jî radibê ser xwe wê gustîlkê jî didîyê dibê diçê mala xwe. Ew jî tê mala xwe. Cihu jî diçê mala xwe wê gustîlkê dikê tilya xwe. Tilya xwe de ba didê û di efrîdê cina ber hazir dibin. Dibêjin: Cihu em dinyayê xirabîkî an avabîkî. Dibêjê ne dinyayê xirakin ne avakin. Keçel û dîya wî ji xanî derêxin, bavêjin ji wî xanîyî de û bila

keça paşê têdebê, jina wî têdebê. Wî xaniyî hişdin bînin werin hewzewanê de dînin. Bînin werin wî xanî û keçî têde hewzewanê dînin. Dibêjin ser serê xwe. Radibê ser xwe şêve keçeluk û dîya wî tavêjin dervê û wî xaniyî hişlînin keça paşê têde tînin hewzewanêde tînin. Sibêhî keçel radibê dirênê ew û dîya xwe wê erdê ripûrut. Weyla evdalê! Ev ka xaniyê me? Cihu lê dirênê lê dirênê keçî hê razahiye. Paşa pê dihesêhê tê. Dibêjê: Keçel ka keça mi? Dibêjê: Wîleh paşayê mi e niza ez jî sibehî rabîme e vê erdê û fêhm dikê gustîlî çûye ji gustîlkê qewmîye. Dibêjê: Keçel. Dibêjê: Çiye? Dibêjê: Deh roj ji te re mihlet te keça mi anî anî te neanî ez ê serê te jêkim. Dibêjê: Wêca em ê çî bikî? Dirênê seyê wa kitka wa jî he li wêdêye. Ew jî wêdê ba wane. Dibêjê: Ez ê çî xwelî li xwekim xudê çû. Wîlêh ti nawê milê mi. Cihuyê gew jî keça paşê çewa radibê çev cihu dikevê dirênê kudêye hañî kudê hema cêhde kumkî ye eciniya li balê heye hema cêhde dikê serê xwe de. Têxê serê xwe de hîç cihu nabîne. Ew cihu dibîne lê cihu wî nabîne. Keçelukê gew digirî, dîya wî digirî. Dibêjê: Em ê vêca çî bikî emê çî xwelîyê li xwekî? Rutnin wê erdê. Nizanê çî bikê. Mane sekinî. Her digirin her dibêjin em ê çî bikî? Axirkê dilê kitkê jî zehf maye wave. Ji xweyve keçeluk jî axayê se û kitkêye. Hêdîyûka se û kitik ji hev re dibêjin ka rabe em ilaçkî bikî. Xudê ma sê roj. Ma sê roj serê axayê me jêkê paşa. Rabe em ka em derkîve herî em vê keçkê nabîni, keça paşê nabîni. Se dibêjê: Ma em kuve herî, em nizanî em ê kuve herî. Ka hema em jî herî. Radibin ser xwe herdu dikevin pê hev. Kitik û se dikevin pê hev diçine. Diçine ber wê avê dirênin heft av pê hevin. Welê dur existîne qesrî jî wî alê avê spî dikê. Dibêjê: Wîleh em herî wê qesrê. Ew jî diçine ber avê disekinî. Se Dibêjê kitkê ti kiçkûkî tê avê de bixeniqî were ser pişta mi ez ê bidim avê kitka gew xwe tavêjê ser pişta sê dikevin avê. Diçin diçin avkî xilas dikin êk dî tê êk dî xilas dikin êk dî tê êk dî xilas dikin hefa heft ava xilas dikin. Hênu qesr wî milê avêye. Dibêjin ka em herî. Wîleh em ji nêza ketîne ka ew çî qesre li wêdê em ê herî wêdê û em ê wêdê têr zikê xwe bixwî nuka herî. Ew jî radibin ser xwe diçin derê qesrê, dura qesrêve tînin diçin niqarine herin malde. Kitî dibêjê sê dibêjê: Ti li vêdê bisekine ti niqarî xwe babêjî derave ez sivikim ez ê herîm balqonê re herîm malde û ezê ji xwe re tiştikî bînim bixwim ez ê ji tere jî wede de babêjim ti newe malde. Dibêjê: Temam. Radibê ser xwe diçê. Diçê dirênê cihu tinê wê erdê re dirêşkîye, dewê wî ji webîye. Keçî ji xwe naxweyê. Ew jî radibê ser xwe wada digerê wada digerê wada digerê dirênê gustîlkî tewanê ve girêdaye aliqandîye. Kitik dibêjê: Hebê tinebê ew gustîlka efrîde cinaye wêdê de. Ew jî radibê ser xwe dibêjê: Ka ewilê em zikê xwe têrkî. Digerê hinî nan

manê hişk mişk dibînê hêdîyûka wêdê de sê re tavêjê. Lê dirênê mişkî ji vêdê de dertkevê dibêjê gup û xwe tavêjê mişkê gew digirê. Mişk dibêjê kitkê: De hema mi nexwe. Dibêjê: Çi re te nexwim? Dibêjê: Hema mi nexwe te çi bivê ez ê bikim. Dibêjê: Ti çi bêjî ez ê guhê xwe bidim te ti mi nexwî. Dibêjê: Nexwe here, here wî kinçkê he wêdaheve biqetêne ka çiye têde. Dibêjê: Temam. Radibê diçê mişkê gew dibêjê kirt kirt -Rasta cihuye ew kinçî-diqetênê gustîlka gew dibêjê rep dikevê devê cihu de. Dikevê devê cihu de cihu devê xwe lê didê hev. Cihu devê xwe didê hev hîç ranabê. Dibêjê: Ka were vêdê. Wîleh ez ê te bixwim qey mi go te biqetêne bikevê devê cihu de. Go ez ci bikim ne suncê mi ne. Dibêjê: Nexwe were ez tişkî dî bêjim ji tere heyne ez ê te bikujim. Tê dibêjê: Here dufkê xwe nav titinê de bike. Nav bîbera tij de bike. Dibêjê: Temam. Radibê diçê dufkê xwe nav hemîyê re dikê. Dibêjê: vêca hêdîyûka pozê cihu bide. Bêxe pozê cihu de qene bêhniyê. Radibê diçê hêdîyûka têxê pozê cihu de halê leqînê pozê wî de cihuyê gew jî dibêjê piş gustîlî dipekê. Gustîlî jê dipekê diçê dera he. Ew jî radibê hema dest tavêjê gustîlkê li xwe didê. Kitka gew li xwe didê. Cihu dibêjê: İhi! Halê ser xwe re dirênê. Dirênê ne gustîlke ne tiye. Kitka gew direvê. Diçê balqonê dirênê kitik û se pê hevin direvin. Aha dibêjê: Wîleh wî heywanî bir. Dibezê berdidê pê wa pa çi nakê wa. Dibê devê kiktê de dibê diçê. Dibêjê: Wîleh gustîlî çû. Diçin ber avê kitik dibêjê sê leza xwe bike man di roj serê axayê me jêkê. Heyne xudê em nekinê serê wî ê paşa jêkê. Dibêjê: Bez de ser pişta mi yaleh dikevê avê. Dikevê avê diçin diçin diçin avkî xilas dikin ya diduva xilas dikin û ya sisîya xilas dikin axirkê yêk tinê dimînê se dibêjê: Gustîlkê bide mi. Kitî dibêjê: Kuro leza xwe bike e nikame bidim te. Maye rojik serê axayê me jêkê. Maye rojik em leza xwe bikî bikênîyê qene serê axayê me jê nekê. Se dibêjê: Ti nedî mi ez te ji vêdê derbas nakim ti nikarî bikevî avêde tê bixeniqî. Dibêjê: Kuro devê te mezine ê ji devê te bikevê. Dibêjê: Nexê divê ti bidî mi heyne te suwar nakim nabim. Ew jî radibê didîyê. Dibêjê: Ha ji tere lêbenê hajê hebe nekevê. Axirkê gustîlka gew didê sê û didin avê. Dibêjê: De were pişta mi. Xwe tavêjê ser pişta dikevin rê. Diçin diçin nîvê avê seyê gew dibêjê: İhi! Dibêjê: Çi bî? Dibêjê: Wîleh gustîlî ket avê de. Dibêjê: Heyla xudê te nehiştî ne mi zanîya tê bêxî avêde, eve hewqa mi got te. me hewqa heta vêdê anî te kir avêde. Em ê çi bikî hêdî? Eve maye rojkî serê axayê me jêkê. Axirkê çin wî milî ji xwere digirîn dikin niç niç. Dibêjin wîleh hêdî em nakî. Em ê hedî kudê bidin vê avê. Wîleh çû. Wêdê disekinî dirênî zilamke wêdê ew jî masuya dertêxê binê avêde. Masuya dertêxê binê avêde. Tura xwe tavêjîyê dertêxê. Ew jî diçin durê ve tîn diçin se û

kitî tîxin new new, hew hew. Zilam dibêjê: Wîleh ew heywanê he jî zehf birçîne her carî  
 ez ê ser navê wa babêjim ka qismetê wa çi werê ez ê bidim wa. Carî tavêjîye tibabî yê hur  
 dikêvinê. Dibêjê: Ev qismetê te ye tavêjê ber sê. Se dikevê ser dixwê. Carîdî jî ser qismetê  
 kitkê tavêjîye û wê carêjî yêk halê mezin qismetê kitkê dikevîyê. Dibêjê: Ha ji te re qismetê  
 te ye jî. Kitî jî şeytane hema evîlê diçê nava wê der di<sup>q</sup>ê. Çewa nava wê der di<sup>q</sup>ê dirênê  
 gustîlî nava wê de ye. Hema dest tavê gustîlkê hêdî xwe masu jî nakê xwey, naxwê. Dest  
 tavê gustîlkê û direvê. Dibêjê: Çibî çibî te çi kir? Dibêjê: Wîleh mi gustîlî dît. Seyê gew jî  
 berdidê pê. Dibêjê: Bide mi. Dibêjê: Wîleh e nadim te, vê carê ti bimirî e nadim te. Berdidê  
 pê û ew direvê ew berdidê pê ew direvê ew berdidê pê. Qava diwestê kitka gew diçê ser  
 kuhê darê. Wêdê sekinî heşa bêhna xwe vet<sup>q</sup>ê. Dîsa dibezê. Dibezê dibêjê dê dê dê dê.  
 Maye rojî sibehî ê serê keçeluk jêkê paşê. Ew jî dibêjê: Dadê dadê wîleh seyê me jî kitka  
 me jî dev ji me berdan çûn. Ew jî tirsahan, ka çewa çêbî ew jî çûn. Ew dibêjê: Ey wîleh  
kurê mi. Ew jî radibê ser xwe hingê dirênê -Pane se dîrek diçê malê kitî xwe xef di<sup>q</sup>ê. Serê  
 bana re mala re diçê- se didê derîve. Dibêjê: Dadê heywanê me esîle wîleh ve se dîsa hat ba  
 me. Ve seyê me hat. Bêhn<sup>q</sup>ukî dimînê dirênê kitîk jî tê. Dibêjê: Wîleh ve kitka me jî hat  
 dadê. Sibehî zamanê serê keçeluke. Rojê wî xilasin ê serê wî jêkin. Ew jî radibê hêdîyûka  
 kitka gew diçê halê gustîlkê berdidê destê keçeluk de. Ser ranê wî rutnê. Halê lê dirênê  
 gustîlkâ wîye destade pa vêca keyfa re difirê. Dibêjê: Dadê dadê xudê da me dîsa. Dibêjê:  
 Çi bî kurê mi? Dibêjê: Kitkê gustîlî anî. Gustîlka mi anî. Dibêjê: Hey nexwe! Dibêjê: Belê  
wîleh. Radibê ser xwe tîxê tîlya xwede dibêjê tamam. Ew jî radibê ser xwe nivê şevê  
 gustîlka xwe ba didê dirênê di efrîdê cina dertkevin. Dibêjin: Keçel em dinyayê xirabîkî an  
 avabîkî. Dibêjê: Ne dinyayê xirakin ne avakin. Xanîyê mê jina mi tede cihu jî tede binin  
 dênin cihê wê. Dibêjin: Ser serê xwe. Sibehî radibin xanîyê wa cihê wê de keçelu û dîya  
 xwe tede. Jina wî ne tede ye lê cihu tede ye. Çeva jina wî dengê keçeluk û xesuya xwe seh  
 di<sup>q</sup>ê kum<sup>q</sup>ê ecinîya serê xwe tîxê. Xwe tavêjin hev, keyfa wa tî. Dibêjê: Roja mi birî ji  
 hingêve cihu mi nedîtîye. Dirênin cihuyê gew wêdê razahî hê razahîye. Radibin ser xwe  
 paşayê gew jî celadê xwe tîne qene serê keçeluk jêkin. Tê dirênin xanîyê wî hazire keça  
 wî pêkhatî vedê. Dibêjin wîleh em serê te re hatbî lê ve te pêk anîye. Cihuyê gew wêdêye  
 radibîn hêstîrkî tîhn di<sup>q</sup>in yêkî birçî di<sup>q</sup>in. Vêca ya tîhn yêm tînin ber ya birçî avê tînin  
 ber. Ew xwe dikişînê ew xwe dikişînê cihuyê gew di<sup>q</sup>ujin tavêjin avê dibêjin de ti here. Ew


jî dimînin ser malê xwe halê xwe paşa ew jî diçin mala xwe. Çîroka me çû deştê, di babê me çûn bihiştê.

## BEŞA DUYEMÎN:


### 1. LI GOR ÇÎROKAN TABLO Û GRAFÎKÊN RÊJEYA TÎPAN

#### 1.1.ÇÎROKA DIENAS


##### 1.1.1. BI ALFABETÎK DI ÇÎROKA DIENAS DE JISEDÎTIYÊN TÎPAN



### 1.1.2. DI ÇÎROKA DIENAS DE JISEDÎTÎYÊN DENGÊN BÊKIRP



### 1.1.3. DI ÇÎROKA DIENAS DE JISEDÎTÎYÊN DENGÊN BIKIRP




Herdu grafikên jorîn de rêje li gor tevahî dengên bikirp û bêkirp hatine dîyar kirin

**1.1.4. TABLOYA HEJMAR Û JISEDÎTIYA TÎPÊN ÇÎROKA DIENAS YÊN  
BIKIRP Û BÊKIRP**

	<b>BÊKIRP</b>	<b>JISEDÎTÎ</b>	<b>BIKIRP</b>	<b>JISEDÎTÎ</b>
<b>A</b>	1174	<b>% 98,9</b>	13	<b>% 1,1</b>
<b>Ç</b>	193	<b>% 68,7</b>	88	<b>% 31,3</b>
<b>E</b>	2052	<b>% 96,1</b>	83	<b>% 3,9</b>
<b>H</b>	419	<b>% 86,4</b>	66	<b>% 13,6</b>
<b>K</b>	180	<b>% 28,6</b>	450	<b>% 71,4</b>
<b>L</b>	210	<b>% 64,8</b>	114	<b>% 35,2</b>
<b>P</b>	54	<b>% 45,4</b>	65	<b>% 54,6</b>
<b>R</b>	608	<b>% 77,5</b>	177	<b>% 22,5</b>
<b>T</b>	72	<b>% 12,5</b>	506	<b>% 87,5</b>
<b>X</b>	344	<b>% 98,6</b>	5	<b>% 1,4</b>
	<b>5306</b>		<b>1567</b>	

**1.1.5. GRAFÎKA HEJMAR Û JISEDÎTIYA TÎPÊN ÇÎROKA DIENAS YÊN BIKIRP Û BÊKIRP**



**1.1.6. TABLOYA TEVAHÎ HEJMAR Û JISEDÎTIYA TÎPÊN ÇÎROKA DIENAS**

	<b>TEVAHÎ</b>	<b>JISEDÎTÎ</b>	<b>BÊKIRP</b>	<b>JISEDÎTÎ</b>	<b>BIKIRP</b>	<b>JISEDÎTÎ</b>
<b>A</b>	1187	% 6,6	1174	% 22,1	13	% 0,8
<b>B</b>	716	% 4,0				
<b>C</b>	61	% 0,3				
<b>Ç</b>	281	% 1,6	193	% 3,6	88	% 5,6
<b>D</b>	1182	% 6,6				
<b>E</b>	2135	% 11,9	2052	% 38,7	83	% 5,3
<b>Ê</b>	1818	% 10,1				
<b>F</b>	85	% 0,5				
<b>G</b>	150	% 0,8				
<b>H</b>	485	% 2,7	419	% 7,9	66	% 4,2
<b>I</b>	1867	% 10,4				
<b>î</b>	823	% 4,6				
<b>J</b>	440	% 2,4				
<b>K</b>	630	% 3,5	180	% 3,4	450	% 28,7
<b>L</b>	324	% 1,8	210	% 4,0	114	% 7,3
<b>M</b>	457	% 2,5				
<b>N</b>	959	% 5,3				
<b>O</b>	103	% 0,6				
<b>P</b>	119	% 0,7	54	% 1,0	65	% 4,1
<b>Q</b>	111	% 0,6				
<b>R</b>	785	% 4,4	608	% 11,5	177	% 11,3
<b>S</b>	371	% 1,2				
<b>Ş</b>	161	% 0,9				
<b>T</b>	578	% 3,2	72	% 1,4	506	% 32,3
<b>U</b>	211	% 1,2				
<b>Û</b>	151	% 0,8				
<b>V</b>	304	% 1,7				
<b>W</b>	585	% 3,3				
<b>X</b>	349	% 1,9	344	% 6,5	5	% 0,3
<b>Y</b>	344	% 1,9				
<b>Z</b>	194	% 1,1				
	<b>17966</b>	<b>% 100</b>	<b>5306</b>	<b>% 100</b>	<b>1567</b>	<b>% 100</b>


Tabloyê de her beş ji hev cihê ye. Her beş nava xwede hatiye hesab kirin.

### 1.1.7. NIRXANDINA ÇÎROKA DIENAS


- Di vê çîrokê de li gorî tablo û grafîkên çîrokê ev encamên giştî xwiya dikin:
- Di vê çîrokê de bidenga herî zêde hatiye bi karanîn “E” ye ( 2135 - % 11,9 )
- Di vê çîrokê de bidenga herî kêr hatiye bi karanîn “O” ye ( 103 - % 0,6 )
- Di vê çîrokê de bédenga herî zêde hatiye bi karanîn “D” ye ( 1182 - % 6,6 )
- Di vê çîrokê de bédenga herî kêr hatiye bi karanîn “C” ye ( 61 - % 0,3 )
- Di vê çîrokê de 1567 tîpen bikirp hene di nav tevahî ( 17966 ) tîpan de ji “ % 8” û di nav tevahî tîpên bikirp-bêkirp ( 6873 ) de ji “ 18,6”e.
- Di vê çîrokê de li nav deh tîpên bikirp û bêkirp de tenê “K”, “T” û “P” yê de hejmar û rêjeya awaya bikirp yên awaya bêkirp zêdetir in.
- Di vê çîrokê de di nav deh tîpên bikirp û bêkirp de ya herî zêde hatiye bikaranîn tîpa “E” yê ye ( 2135 ). Rêjeya rewşa vê tîpê ya bêkirp ji “% 96,1”e. Rêjeya rewşa bikirp jî ji “% 3,9”e.
- Di vê çîrokê de di nav deh tîpên bikirp û bêkirp de ya herî kêr hatiye bikaranîn tîpa “P” yê ye ( 119 ). Rêjeya rewşa vê tîpê ya bêkirp ji “% 45,5”e. Rêjeya rewşa bikirp jî ji “% 54,6”e.
- Di Çiroka Dienas de derheqê bikirp û bêkirpan de ev jî divê verin gotin: Zêdebûna ‘Ç’ yên bêkirp ji ber bi karanîna peyva keç-keçik ye ( 52 ). ‘E’ yên bêkirp vê çîrokê de zêdene ji ber ku mêtnê de peyva dienas (61) pir hatiye karanîn. Cardin ‘L’ yên bikirp zêdene ji ber ku mêtnê de peyvên wileh (31) û xêl (13) pir hatine bi karanîn.

## 1.2.ÇİROKA MÎRZA MIHEME


### 1.2.1.BI ALFABETİK DI ÇİROKA MÎRZA MIHEME DE JISEDÎTIYÊN TÎPAN



### 1.2.2. DI ÇÎROKA MÎRZA MIHEME DE JISEDÎTIYÊN DENGÊN BÊKIRP



### 1.2.3. DI ÇÎROKA MÎRZA MIHEME DE JISEDÎTIYÊN DENGÊN BIKIRP




Herdu grafîkên jorîn de rêje li gor tevahî dengên bikirp û bêkirp hatine dîyar kirin

**1.2.4. TABLOYA HEJMAR Û JISEDÎTIYÊN TÎPÊN ÇÎROKA MÎRZA MIHEME  
YÊN BIKIRP Û BÊKIRP**

	<b>BÊKIRP</b>	<b>JISEDÎTÎ</b>	<b>BIKIRP</b>	<b>JISEDÎTÎ</b>
<b>A</b>	514	<b>% 99,2</b>	4	<b>% 0,8</b>
<b>Ç</b>	80	<b>% 86</b>	13	<b>% 14</b>
<b>E</b>	1023	<b>% 99,1</b>	9	<b>% 0,9</b>
<b>H</b>	194	<b>% 72,1</b>	75	<b>% 27,9</b>
<b>K</b>	80	<b>% 30,9</b>	179	<b>% 69,1</b>
<b>L</b>	106	<b>% 74,6</b>	36	<b>% 25,4</b>
<b>P</b>	33	<b>% 50</b>	33	<b>% 50</b>
<b>R</b>	318	<b>% 78,9</b>	85	<b>% 21,1</b>
<b>T</b>	41	<b>% 14,7</b>	238	<b>% 85,3</b>
<b>X</b>	153	<b>% 98,7</b>	2	<b>% 1,3</b>
	<b>2542</b>		<b>674</b>	

**1.2.5. GRAFİKA HEJMAR Û JISEDÎTIYÊN TÎPÊN ÇÎROKA MÎRZA MIHEME YÊN BİKIRP Û BÊKIRP**



**1.2.6. TABLOYA TEVAHÎ HEJMAR Û JISEDÎTIYÊN TÎPÊN ÇÎROKA MÎRZA MIHEME**

	<b>TEVAHÎ</b>	<b>JISEDÎTÎ</b>	<b>BÊKIRP</b>	<b>JISEDÎTÎ</b>	<b>BIKIRP</b>	<b>JISEDÎTÎ</b>
<b>A</b>	518	% 6,7	514	% 20,2	4	% 0,6
<b>B</b>	296	% 3,8				
<b>C</b>	20	% 0,3				
<b>Ç</b>	93	% 1,2	80	% 3,1	13	% 1,9
<b>D</b>	433	% 5,6				
<b>E</b>	1032	% 13,3	1023	%40,2	9	% 1,3
<b>Ê</b>	738	% 9,5				
<b>F</b>	35	% 0,5				
<b>G</b>	50	% 0,6				
<b>H</b>	269	% 3,5	194	% 7,6	75	% 11,1
<b>I</b>	757	% 9,8				
<b>Î</b>	358	% 5,0				
<b>J</b>	190	% 2,4				
<b>K</b>	259	% 3,3	80	% 3,1	179	% 26,6
<b>L</b>	142	% 1,8	106	% 4,2	36	% 5,3
<b>M</b>	337	% 4,3				
<b>N</b>	262	% 3,4				
<b>O</b>	36	% 0,5				
<b>P</b>	66	% 0,9	33	% 1,3	33	% 4,9
<b>Q</b>	22	% 0,3				
<b>R</b>	403	% 5,2	318	% 12,5	85	% 12,6
<b>S</b>	133	% 1,7				
<b>Ş</b>	94	% 1,2				
<b>T</b>	279	% 3,6	41	%1,6	238	% 35,3
<b>U</b>	70	% 0,9				
<b>Û</b>	42	% 0,5				
<b>V</b>	140	% 1,8				
<b>W</b>	237	% 3,1				
<b>X</b>	155	% 2,0	153	% 6	2	% 0,3
<b>Y</b>	140	% 1,8				
<b>Z</b>	126	% 1,6				
	<b>7732</b>	<b>% 100</b>	<b>2542</b>	<b>% 100</b>	<b>674</b>	<b>% 100</b>


Tabloyê de her beş ji hev cihê ye. Her beş nava xwe de hatiye hesap kirin.

### 1.2.7. NIRXANDINA ÇÎROKA MÎRZA MIHEME


- Di vê çîrokê de li gorî tablo û grafîkên çîrokê ev encamên giştî xwiya dikin:
- Di vê çîrokê de bidenga herî zêde hatiye bi karanîn “E” ye ( 1032 - % 13,3 )
- Di vê çîrokê de bidenga herî kêr hatiye bi karanîn “O” ye ( 36 - % 0,5 )
- Di vê çîrokê de bêdenga herî zêde hatiye bi karanîn “D” ye ( 433 - % 5,6 )
- Di vê çîrokê de bêdenga herî kêr hatiye bi karanîn “C” ye ( 20 - % 0,3 )
- Di vê çîrokê de 674 tîpen bikirp hene di nav tevahî ( 7732 ) tîpan de ji “ % 8” û di nav tevahî tîpên bikirp-bêkirp ( 3216 ) de ji “ 17,3”e.
- Di vê çîrokê de li nav deh tîpên bikirp û bêkirp de tenê “K” û “T” yê de hejmar û rêjeya awaya bikirp yê awaya bêkirp zêdetir in.
- Di vê çîrokê de di nav deh tîpên bikirp û bêkirp de ya herî zêde hatiye bikaranîn tîpa “E” yê ye ( 1032 ). Rêjeya rewşa vê tîpê ya bêkirp ji “% 99,1”e. Rêjeya rewşa bikirp jî ji “% 0,9”e.
- Di vê çîrokê de di nav deh tîpên bikirp û bêkirp de ya herî kêr hatiye bikaranîn tîpa “Ç” yê ye ( 20 ). Rêjeya rewşa vê tîpê ya bêkirp ji “% 86”e. Rêjeya rewşa bikirp jî ji “% 14”e.
- Di Çiroka Mîrza Miheme de derheqê bikirp û bêkirpan de ev jî divê verin gotin: ‘H’ yê bikirp zêdene ji ber ku metnê de peyvên ‘H’ ya bikirp tê de heyî zêde hatine karanîn. Ew peyv jî li gor rêzê evin: Miheme (23), zehf (17) û hemam (12) cara hatine karanîn.

## 2.1. ÇİROKA KEÇELUK


### 1.3.1. BI ALFABETİK DI ÇİROKA KEÇELUK DE JISEDİTIYÊN TÎPAN



### 1.3.2. DI ÇÎROKA KEÇELUK DE JISEDÎTIYÊN DENGÊN BÊKIRP



### 1.3.3. DI ÇÎROKA KEÇELUK DE JISEDÎTIYÊN DENGÊN BIKIRP




Herdu grafikên jorîn de rêje li gor tevahî dengên bikirp û bêkirp hatine dîyar kirin .

**1.3.4. TABLOYA HEJMAR Û JISEDÎTIYÊN TÎPÊN ÇÎROKA KEÇELUK YÊN BIKIRP Û BÊKIRP**

	<b>BÊKIRP</b>	<b>JISEDÎTÎ</b>	<b>BIKIRP</b>	<b>JISEDÎTÎ</b>
<b>A</b>	1178	<b>% 99,7</b>	4	<b>% 0,3</b>
<b>Ç</b>	169	<b>% 64,3</b>	94	<b>% 35,7</b>
<b>E</b>	1970	<b>% 98,9</b>	21	<b>% 1,1</b>
<b>H</b>	367	<b>% 83,6</b>	72	<b>% 16,4</b>
<b>K</b>	192	<b>% 32,5</b>	398	<b>% 67,5</b>
<b>L</b>	272	<b>% 80,7</b>	65	<b>% 19,3</b>
<b>P</b>	46	<b>% 35,1</b>	85	<b>% 64,9</b>
<b>R</b>	524	<b>% 70,8</b>	216	<b>% 29,2</b>
<b>T</b>	84	<b>% 15,6</b>	454	<b>% 84,4</b>
<b>X</b>	319	<b>% 98,5</b>	5	<b>% 1,5</b>
	<b>5121</b>		<b>1414</b>	

**1.3.5. GRAFİKA HEJMAR Û JISEDİTIYÊN TÎPÊN ÇÎROKA KEÇELUK YÊN BİKIRP Û BÊKIRP**



**1.3.6. TABLOYA HEJMAR Û JISEDÎTIYÊN TÎPÊN ÇÎROKA KEÇELUK**

	<b>TEVAHÎ</b>	<b>JISEDÎTÎ</b>	<b>BÊKIRP</b>	<b>JISEDÎTÎ</b>	<b>BIKIRP</b>	<b>JISEDÎTÎ</b>
<b>A</b>	1182	% 6,9	1178	% 23,0	4	% 0,3
<b>B</b>	686	% 4,0				
<b>C</b>	76	% 0,4				
<b>Ç</b>	263	% 1,5	169	% 3,3	94	% 6,6
<b>D</b>	1116	% 6,5				
<b>E</b>	1991	% 11,7	1970	% 38,5	21	% 1,5
<b>Ê</b>	1786	% 10,5				
<b>F</b>	76	% 0,4				
<b>G</b>	145	% 0,8				
<b>H</b>	439	% 2,6	367	% 7,2	72	% 5,1
<b>I</b>	1739	% 10,2				
<b>î</b>	833	% 4,9				
<b>J</b>	434	% 2,5				
<b>K</b>	590	% 3,5	192	% 3,7	398	% 28,1
<b>L</b>	337	% 2,0	272	% 5,3	65	% 4,6
<b>M</b>	541	% 3,2				
<b>N</b>	832	% 4,9				
<b>O</b>	92	% 0,5				
<b>P</b>	131	% 0,8	46	% 0,9	85	% 6,0
<b>Q</b>	66	% 0,4				
<b>R</b>	740	% 4,3	524	% 10,2	216	% 15,3
<b>S</b>	316	% 1,9				
<b>Ş</b>	138	% 0,8				
<b>T</b>	538	% 3,1	84	% 1,6	454	% 32,1
<b>U</b>	218	% 1,3				
<b>Û</b>	78	% 0,5				
<b>V</b>	293	% 1,7				
<b>W</b>	600	% 3,5				
<b>X</b>	324	% 1,9	319	% 6,2	5	% 0,4
<b>Y</b>	326	% 1,9				
<b>Z</b>	154	% 0,9				
	<b>17080</b>	<b>% 100</b>	<b>5121</b>	<b>% 100</b>	<b>1414</b>	<b>% 100</b>

Tabloyê de her beş ji hev cihê ye. Her beş nava xwe de hatiye hesap kirin.

### 1.3.7. NIRXANDINA ÇÎROKA KEÇELUK

- Di vê çîrokê de li gorî tablo û grafîkên çîrokê ev encamên giştî xwiya dikin:
- Di vê çîrokê de bidenga herî zêde hatiye bi karanîn "E" ye ( 1991 - % 11,7 )
- Di vê çîrokê de bidenga herî kêr hatiye bi karanîn "Û" ye ( 78 - % 0,5 )
- Di vê çîrokê de bédenga herî zêde hatiye bi karanîn "D" ye ( 1116 - % 6,5 )
- Di vê çîrokê de bédenga herî kêr hatiye bi karanîn "Q" ye ( 66 - % 0,4 )
- Di vê çîrokê de 1414 tîpen bikirp hene di nav tevahî ( 17080 ) tîpan de ji " % 7,6" û di nav tevahî tîpên bikirp-bêkirp ( 6535 ) de ji " 17,8" e.
- Di vê çîrokê de li nav deh tîpên bikirp û bêkirp de tenê "K", "P" û "T" yê de hejmar û rêjeya awaya bikirp yên awaya bêkirp zêdetir in.
- Di vê çîrokê de di nav deh tîpên bikirp û bêkirp de ya herî zêde hatiye bikaranîn tîpa "E" yê ye ( 1991 ). Rêjeya rewşa vê tîpê ya bêkirp ji " % 98,9" e. Rêjeya rewşa bikirp jî ji " % 1,1" e.
- Di vê çîrokê de di nav deh tîpên bikirp û bêkirp de ya herî kêr hatiye bikaranîn tîpa "Ç" yê ye ( 76 ). Rêjeya rewşa vê tîpê ya bêkirp ji " % 64,3" e. Rêjeya rewşa bikirp jî ji " % 35,7" e.
- Di Çiroka Mîrza Miheme de derheqê bikirp û bêkirpan de ev jî divê verin gotin: 'Ç' yên bikirp zêdene ji ber ku mêtne de peyva keçel (44) pir hatiye karanîn.


**1.4. TABLO YA GIŞTÎ HEJMARÊN TÎPAN LI GOR ÇÎROKAN**

	ÇÎROKA MÎRZA MIHEME			ÇÎROKA DIENAS			ÇÎROKA KEÇELUK		
	TEV.	BÊKIRP	BIKIRP	TEV.	BÊKIRP	BIKIRP	TEV.	BÊKIRP	BIKIRP
A	518	514	4	1187	1174	13	1182	1178	4
B	296			716			686		
C	20			61			76		
Ç	93	80	13	281	193	88	263	169	94
D	433			1182			1116		
E	1032	1023	9	2135	2052	83	1991	1970	21
Ê	738			1818			1786		
F	35			85			76		
G	50			150			145		
H	269	194	75	485	419	66	439	367	72
I	757			1867			1739		
î	358			823			833		
J	190			440			434		
K	259	80	179	630	180	450	590	192	398
L	142	106	36	324	210	114	337	272	65
M	337			457			541		
N	262			959			832		
O	36			103			92		
P	66	33	33	119	54	65	131	46	85
Q	22			111			66		
R	403	318	85	785	608	177	740	524	216
S	133			371			316		
Ş	94			161			138		
T	279	41	238	578	72	506	538	84	454
U	70			211			218		
Û	42			151			78		
V	140			304			293		
W	237			585			600		
X	155	153	2	349	344	5	324	319	5
Y	140			344			326		
Z	126			194			154		
	7732	2542	674	17966	5306	1567	17080	5121	1414


## 2. TABLO Û GRAFÎKÊN GIŞTÎ

### 2.1.GRAFÎKÊN TEVAHIYA ALFABÊ

#### 2.1.1. GRAFÎKA JISETÎTIYA TÎPAN AWAYA ALFABETÎK



## 2.1.2. GRAFÏKA TÏPAN A LI GOR RËZKIRINA JISEDÏTIYË




### 2.1.3. NIRXANDINA GRAFÎKÊN TEVAHIYA ALFABÊ

Çewa ku di grafîkan de jî xuya dike;


- Bidenga herî zêde hatiye bi karanîn “E” ye ( 5158 - % 12,1 )
  - Bidenga herî kêr hatiye bi karanîn “O” ye ( 231 - % 0,5 )
  - Bêdenga herî zêde hatiye bi karanîn “D” ye ( 2731 - % 6,4 )
  - Bêdenga herî kêr hatiye bi karanîn “C” ye ( 157 - % 0,4 )
- Di nav metnan de peyva “dibêje” 460 cara dibore. Evê bandor lê kiriye ku nava tîpên bêdeng de derkevê pêş. “D” yê peyva dibêje de diborin di nav tevahî tîpan ( 42778 ) de “ % 1,1” Di nav tevahiya tîpa “D” (2731 ) ye de jî “ 14,4”

## 2.2. GRAFİK Ü TABLOYÊN DENGÊN BIKIRP Ü BÊKIRP

### 2.2.1. GRAFİKA TEVAHÎ DENGÊN BÊKIRP




### 2.2.2. GRAFİKA TEVAHÎ DENGÊN BIKIRP




Herdu grafikên jorîn de rêje li gor tevahî dengên bikirp û bêkirp hatine dîyar kirin .

### 2.2.3. GRAFİKA TEVAHÎ DENGÊN BİKİRP Û BÊKİRP 1



### 2.2.4. GRAFİKA TEVAHÎ DENGÊN BİKİRP Û BÊKİRP 2




Herdu grafikên jorîn de rêje li gor tevahî dengên bikirp û bêkirp hatine diyar kirin.

**2.2.5. TABLO YA TEVAHÎ HEJMAR Û JISEDÎTIYÊN TÎPÊN BIKIRP Û BÊKIRP**

	<b>BÊKIRP</b>	<b>JISEDÎTÎ</b>	<b>BIKIRP</b>	<b>JISEDÎTÎ</b>
<b>A</b>	2866	<b>99,3</b>	21	<b>0,7</b>
<b>Ç</b>	442	<b>69,4</b>	195	<b>30,6</b>
<b>E</b>	5045	<b>97,8</b>	113	<b>2,2</b>
<b>H</b>	980	<b>82,1</b>	213	<b>17,9</b>
<b>K</b>	452	<b>30,6</b>	1027	<b>69,4</b>
<b>L</b>	588	<b>73,2</b>	215	<b>26,8</b>
<b>P</b>	133	<b>42,1</b>	183	<b>57,9</b>
<b>R</b>	1450	<b>75,2</b>	478	<b>24,8</b>
<b>T</b>	197	<b>13</b>	1198	<b>87</b>
<b>X</b>	816	<b>98,6</b>	12	<b>1,4</b>
	<b>12969</b>		<b>3655</b>	

## 2.2.6. GRAFÎKA TEVAHÎ HEJMAR Û JISEDÎTIYÊN TÎPÊN BIKIRP Û BÊKIRP




### 2.2.7. NIRXANDINA GRAFÎK Û TABLOYÊ DENGÊN BIKIRP Û BÊKIRP

- Di nav dengê bikirp de ya herî zêde hatiye bi karanîn “T” ye ( 1198 - % 32,8 )
- Di nav dengê bikirp de ya herî kêr hatiye bi karanîn “X” ye ( 12 - % 0,3 )
- Di nav dengê bêkirp de ya herî zêde hatiye bi karanîn “E” ye ( 5045 - % 38,9 )
- Di nav dengê bêkirp de ya herî kêr hatiye bi karanîn “P” ye ( 133 - % 1,0 )
- Di nav deh tîpan de rêjeya bikirpên heft heban (A, Ç, E, H, L, R, X ) bêkirpan zêdeye. Sê hebên rêjeya bêkirpên van ji rêjeya bikirpên van zêde “ P, K û T” ye.
- Jisedîtiya tîpan ya nava xwe de yan herî zêde cudatî heyî tîpa “A” ye yê ( bikirp 21 - %0,7 bêkirp 2866 - % 99,3 )
- Sedemên zêdebûna bikirpên hin dengên di nirxandinên çîrokan de hatibû diyar kirin. Ji ber vê ne pêwîste ku vêde cardin werê diyar kirin.

### 2.3. GRAFÎK Û TABLOYÊN DENGÊN BIKIRP Û BÊKIRP YÊN LI GOR SÊRÊ BÊJEYÊ

#### 2.3.1. GRAFÎKA HEJMAR Û RÊJEYA TÎPÊN SERÊ BÊJEYAN YÊN BIKIRP Û BÊKIRP



**2.3.2. TABLOYA HEJMAR Û RÊJEYA TÎPÊN SERÊ BÊJEYAN YÊN BIKIRP Û BÊKIRP**


	<b>TEVAHÎ</b>	<b>BIKIRP</b>	<b>JISEDÎTÎ</b>	<b>BÊKIRP</b>	<b>JISEDÎTÎ</b>
<b>A</b>	<b>135</b>	<b>9</b>	<b>% 6,7</b>	<b>126</b>	<b>% 93,3</b>
<b>Ç</b>	<b>277</b>	<b>26</b>	<b>% 9,4</b>	<b>251</b>	<b>% 90,6</b>
<b>E</b>	<b>429</b>	<b>52</b>	<b>% 12,1</b>	<b>380</b>	<b>% 87,9</b>
<b>H</b>	<b>784</b>	<b>126</b>	<b>% 16,1</b>	<b>658</b>	<b>% 83,9</b>
<b>K</b>	<b>509</b>	<b>209</b>	<b>% 41,1</b>	<b>300</b>	<b>% 58,9</b>
<b>L</b>	<b>117</b>	<b>35</b>	<b>% 29,9</b>	<b>82</b>	<b>% 70,1</b>
<b>P</b>	<b>262</b>	<b>130</b>	<b>% 49,6</b>	<b>132</b>	<b>% 50,4</b>
<b>R</b>	<b>382</b>	<b>382</b>	<b>% 100</b>	<b>0</b>	<b>% 0</b>
<b>T</b>	<b>726</b>	<b>550</b>	<b>% 75,8</b>	<b>176</b>	<b>% 24,2</b>
<b>X</b>	<b>606</b>	<b>4</b>	<b>% 0,7</b>	<b>602</b>	<b>% 99,3</b>
	<b>4227</b>	<b>1523</b>		<b>2707</b>	

### 2.3.3. NIRXANDINA GRAFÎK Û TABLOYÊN DENGÊN BIKIRP Û BÊKIRP YÊN LI GOR SÊRÊ BÊJEYÊ

- Di serê bêjeyê de ji grafîk û tabloyan jî diyare ku piraniya tîpan bêkirpin.
  - Di serê bêjeyê de bikirpa herî zêde tê bi karanîn “R” ye ( 382 - % 100 )
  - Di serê bêjeyê de bikirpa herî kêr tê bi karanîn “X” ye ( 4 - % 0,7 )
  - Di serê bêjeyê de bêkirpa herî zêde tê bi karanîn “X” ye ( 602 - % 99,3 )
  - Di serê bêjeyê de bêkirpa herî kêr tê bi karanîn “R” ye ( 0 - % 0 )
- Di metnan de hejmara “E” yê bikirp 113 e. Ji van 61 heb di nava navê lehengê çîrokê “Dianas” de diborê. Şunde dimênin 52. Tiştê ku balkêş ji van 49 heb serê bêjeyê de ne. Di nava peyvên wek erd ( 18 ), eynî ( 12 ) û efrîd ( 9 ) de diborin.

## 2.4. GRAFÎKA TÎPÊN BÊDENG Û BIDENG

### 2.4.1. GRAFÎKA RÊJEYA BÊGENG Û BIDENGA




### 2.4.2. NIRXANDINA GRAFÎKA TÎPÊN BÊDENG Û BIDENG


- Di vê grafîkê de tiştê ku balê dikişîne; her çiqas heşt heb tipên bideng bist û sê heb tipên bêdengbi jî rêje û hejmara bi karanîna bidengan nezî bêdengaye.

### 3. HEVBERÎ KIRINA VÊ XEBATÊ YA BARAN RIZGAR Û CELADET BEDIRXAN RE

#### 3.1. GRAFÎKA TÎPAN A LI GOR RÊZKIRINA JISEDÎTIYÊ YA VÊ XEBATÊ




### 3.2. GRAFİKA TİPAN A LI GOR RÊZKIRINA JISEDÎTİYÊ YA XEBATA BARAN RIZGAR<sup>1</sup>



<sup>1</sup> Baran Rizgar, Uygulamalı Kürtçe Dersleri/Dersên Kurdî, Lithosphere Printing Cooperative, 1993, r.392

### 3.3. GRAFÎKA TÎPAN A LI GOR RÊZKIRINA JISEDÎTIYÊ YA XEBATA CELADET BEDIRXAN



**3.4. TABLOYA ALFABETİK HEVBERİ KIRINA GIŞTİ YA VÊ XEBATÊ,  
XEBATA BARAN RİZGAR Û CELADET BEDIRXAN**


	EV XEBAT		XEBATA BARAN RIZGAR		XEBATA CELADET BEDIRXAN	
	HEJMAR	JISEDÎTÎ	HEJMAR	JISEDÎTÎ	HEJMAR	JISEDÎTÎ
<b>A</b>	2887	% 6,7	5882	% 8,1	1500	% 8,5
<b>B</b>	1698	% 4,0	3180	% 4,4	650	% 3,7
<b>C</b>	157	% 0,4	661	% 0,9	120	% 0,7
<b>Ç</b>	637	% 1,5	825	% 1,1	150	% 0,8
<b>D</b>	2731	% 6,4	2744	% 3,8	840	% 4,8
<b>E</b>	5158	% 12,1	8510	% 11,7	2200	% 12,4
<b>Ê</b>	4342	% 10,2	1577	% 2,2	1000	% 5,7
<b>F</b>	196	% 0,5	677	% 0,9	150	% 0,8
<b>G</b>	345	% 0,8	1426	% 2	200	% 1,1
<b>H</b>	1193	% 2,8	1862	% 2,6	350	% 2
<b>I</b>	4363	% 10,2	6190	% 8,9	1800	% 10,2
<b>î</b>	2014	% 4,7	3855	% 5,3	700	% 4
<b>J</b>	1064	% 2,5	620	% 0,9	300	% 1,7
<b>K</b>	1479	% 3,5	2590	% 3,6	650	% 3,7
<b>L</b>	803	% 1,9	2237	% 3,1	450	% 2,5
<b>M</b>	1335	% 3,1	1888	% 2,6	550	% 3,1
<b>N</b>	2053	% 4,8	5806	% 8	1300	% 7,4
<b>O</b>	231	% 0,5	1316	% 1,8	400	% 2,3
<b>P</b>	316	% 0,7	1140	% 1,6	120	% 0,7
<b>Q</b>	199	% 0,5	1002	% 1,4	140	% 0,8
<b>R</b>	1928	% 4,5	5380	% 7,4	1100	% 6,2
<b>S</b>	820	% 1,9	1914	% 2,6	340	% 1,9
<b>Ş</b>	393	% 0,9	1443	% 2	160	% 0,9
<b>T</b>	1395	% 3,3	2459	% 3,4	400	% 2,3
<b>U</b>	499	% 1,2	797	% 1,1	120	% 0,2
<b>Û</b>	271	% 0,6	904	% 1,2	450	% 2,5
<b>V</b>	737	% 1,7	1363	% 1,9	500	% 2,8
<b>W</b>	1422	% 3,3	1153	% 1,6	350	% 2
<b>X</b>	828	% 1,9	1106	% 1,5	340	% 1,9
<b>Y</b>	810	% 1,9	731	% 1	200	% 1,1
<b>Z</b>	474	% 1,1	1283	% 1,8	150	0,8
	<b>42778</b>	<b>% 100</b>	<b>72521</b>	<b>% 100</b>	<b>17680</b>	<b>% 100</b>

**3.5. GRAFÎKA HEVBERÎ KIRINA TÎPÊN BIKIRP Û BÊKIRP A LI GOR VÊ XEBATÊ Û XEBATA BARAN RÎZGAR<sup>2</sup>**


	EV XEBAT		XEBATA RIZGAR BARAN		EV XEBAT		XEBATA RIZGAR BARAN	
	BÊKIRP	JISEDÎTÎ	BÊKIRP	JISEDÎTÎ	BIKIRP	JISEDÎTÎ	BIKIRP	JISEDÎTÎ
<b>Ç</b>	442	<b>% 69,4</b>	475	<b>% 57,6</b>	195	<b>% 30,6</b>	350	<b>% 42,4</b>
<b>E</b>	5045	<b>% 97,8</b>	8394	<b>% 98,6</b>	113	<b>% 2,2</b>	116	<b>% 1,4</b>
<b>H</b>	980	<b>% 82,1</b>	1476	<b>% 79,3</b>	213	<b>% 17,9</b>	386	<b>% 20,7</b>
<b>K</b>	452	<b>% 30,6</b>	820	<b>% 31,7</b>	1027	<b>% 69,4</b>	1770	<b>% 68,3</b>
<b>P</b>	133	<b>% 42,1</b>	723	<b>% 63,4</b>	183	<b>% 57,9</b>	417	<b>% 36,6</b>
<b>R</b>	1450	<b>% 75,2</b>	4036	<b>% 75</b>	478	<b>% 24,8</b>	1344	<b>% 25</b>
<b>T</b>	197	<b>% 13</b>	1799	<b>% 73,2</b>	1198	<b>% 87</b>	660	<b>% 26,8</b>
<b>X</b>	816	<b>% 98,6</b>	996	<b>% 90,1</b>	12	<b>% 1,4</b>	110	<b>% 9,9</b>
	<b>9515</b>		<b>18719</b>		<b>3419</b>		<b>5153</b>	

<sup>2</sup> Baran Rizgar, Uygulamalı Kürtçe Dersleri/Dersên Kurdî, Lithosphere Printing Cooperative, 1993, r.389-390

### 3.6. GRAFÏKA LI GOR VË XEBATË SERË BËJEYE DE RËJEYA TÏPAN



### 3.7. GRAFÎKA LI GOR CELADET BEDÎRXAN SERÊ BÊJEYE DE RÊJEYA TÎPAN<sup>3</sup>



<sup>3</sup> Emîr Celadet Bedir Xan & Roger Lescot, Kürtçe Dilbilgisi ( Kurmancî ) Doz Yayınları, 1997, r.50

**3.8. TABLOYA HEVBERÎ KIRINA HEJMAR Û JISEDÎTIYÊN TÎPÊN SERÊ BÊJEYÊ YA XEBATA CELADET BEDIRXAN<sup>4</sup> Û VÊ XEBATÊ**

	EV XEBAT		XEBATA CELADET BEDIRXAN	
	HEJMAR	JISEDÎTÎ	HEJMAR	JISEDÎTÎ
<b>A</b>	135	% 1,3	97	% 2,2
<b>B</b>	744	% 7,1	238	% 5,5
<b>C</b>	93	% 0,9	135	% 3,1
<b>Ç</b>	277	% 2,6	179	% 4,1
<b>D</b>	1920	% 18,3	282	% 6,5
<b>E</b>	429	% 4,1	120	% 2,8
<b>Ê</b>	29	% 0,3	11	% 0,3
<b>F</b>	35	% 0,3	111	% 2,5
<b>G</b>	257	% 2,5	184	% 4,2
<b>H</b>	784	% 7,5	258	% 5,9
<b>I</b>	27	% 0,3	16	% 0,4
<b>î</b>	33	% 0,3	12	% 0,3
<b>J</b>	435	% 4,2	22	% 0,5
<b>K</b>	509	% 4,9	417	% 9,6
<b>L</b>	117	% 1,1	96	% 2,2
<b>M</b>	684	% 6,5	259	% 5,9
<b>N</b>	329	% 3,7	126	% 2,9
<b>O</b>	11	% 0,1	5	% 0,1
<b>P</b>	262	% 2,5	195	% 4,5
<b>Q</b>	121	% 1,2	170	% 3,9
<b>R</b>	382	% 3,6	215	% 4,9
<b>S</b>	422	% 4,0	292	% 6,7
<b>Ş</b>	54	% 0,5	188	% 4,3
<b>T</b>	726	% 6,9	275	% 6,3
<b>U</b>	0	% 0,0	0	% 0
<b>Û</b>	0	% 0,0	4	% 0,1
<b>V</b>	183	% 1,7	44	% 1
<b>W</b>	580	% 5,5	28	% 0,6
<b>X</b>	606	% 5,8	227	% 5,2
<b>Y</b>	109	% 1,0	4	% 0,1
<b>Z</b>	118	% 1,1	148	% 3,4
	<b>10411</b>	<b>100</b>	<b>4358</b>	<b>100</b>

<sup>4</sup> Emîr Celadet Bedir Xan & Roger Lescot, Kûrtçe Dilbilgisi ( Kurmancî ) Doz Yayınları, 1997, r.50

### 3.9. NIRXANDINA HEVBERÎ KIRINA VÊ XEBATÊ YA BARAN RIZGAR Û CELADET BEDIRXAN RE

- Ligor rêje û hejmarên bi karanîna tîpan;
  - Tîpa herî zêde hatiye bi karanîn li gor hersê xebatan jî “E” ye
  - Bidenga herî kêma hatiye bi karanîn li gor vê xebatê û herdû xebatên din ji hev cudaye; li gor vê xebatê “O” ye ( 231 - % 0,5 ) li gor xebata Baran Rizgar “U” ye ( 797 - % 1,1 ) li gor Celadet Bedirxan jî “U” ye ( 120 – % 0,7 )
  - Bêdenga herî zêde hatiye bi karanîn li gor vê xebatê û herdû xebatên din ji hev cudaye; li gor vê xebatê “D” ye ( 2731 - % 6,4 ) li gor xebata Baran Rizgar “N” ye ( 5806 - % 8,0 ) li gor Celadet Bedirxan jî “N” ye ( 1300 – % 7,4 )
  - Bêdenga herî kêma hatiye bi karanîn li gor hersê xebatan jî ji hev cudaye; li gor vê xebatê “C” ye ( 157 - % 0,4 ) li gor xebata Baran Rizgar “J” ye ( 620 - % 0,9 ) li gor Celadet Bedirxan “P” ye ( 120 – % 0,7 )
- Ligor rêje û hejmarên bi karanîna dengên bikirp û bêkirpan;
  - Rêjeyên bikaranîna bikirp û bêkirpan vê xebatede jî xebata Baran Rizgar de jî piranî nezî hevin. Tenê “X”ê de cudahî heye. Li gor vê xebatê “X”ên bikirp ji % 1,4 in lê gor xebata Baran Rizgar ji % 9,9 e.
- Li gor Tîpên Serê bêjeye;
  - Bidenga herî zêde hatiye bi karanîn li gor vê xebatê “E” ye ( 429 - % 4,1 ) li gor xebata Celadet Bedirxan jî “E” ye ( 120 – % 2,8 )
  - Bidenga herî kêma hatiye bi karanîn li gor vê xebatê “U” ye ( 0 - % 0 ) li gor xebata Celadet Bedirxan jî “U” ye ( 0 – % 0 )
  - Bêdenga herî zêde hatiye bi karanîn li gor vê xebatê “D” ye ( 1920 - % 18,3 ) li gor xebata Celadet Bedirxan “K” ye ( 417 – % 9,6 )
  - Bêdenga herî kêma hatiye bi karanîn li gor vê xebatê “F” ye ( 35 - % 0,3 ) li gor xebata Celadet Bedirxan “Y” ye ( 4 – % 0,1 )
  - Ev xebat li ser çîroka hatiye kirin lê em nizanin ku Celadet Bedirxan ser çî metnî xebitiye. Çîrokan de gotinên kalib û dubare zêdene ev jî li ser rêje û hejmaran bandor dike.

## ENCAM

- Ev xebat li ser 42778 tîpan hatiye kirin û bi giştî herî tîpa zêde ‘E’ ( 4827 - % 14,1 ) hatiye bi karanîn. Herî kêr ( 120 - % 0,4 ) tîpa ‘F’ yê berbiçav ve.
- Xebata Celadet Bedirxan de bi giştî herî zêde ( 2200 - % 12,4 ) ‘E’ hatiye bi karanîn. Herî kêr ( 120 - % 0,7 ) ‘U’, ‘P’ û ‘C’ hatine bi kar anîn.
- Xebata Baran Rizgar de herî zêde ( 8510 - % 11,7 ) ‘E’ hatiye bi karanîn. Herî kêr ( 620 - % 0,9 ) tîpa ‘J’ yê berbiçav ve.
- Di xebata Celadet Bedirxan de serê peyvan de herî zêde tîpa ‘K’ yê hatiye bi karanîn ( 417 - % 9,6 ). Herî kêr ‘Y’ û ‘Û’ ( 4 - % 0,1 ) hatine bi karanîn ( ‘U’ di serê peyvan de qet tune ).
- Di vê xebatê de serê peyvan de herî zêde ‘D’ hatiye bi kar anîn ( 1920 - % 18,3 ). Herî kêr ( 11 - % 0,1 ) ‘O’ hatiye bi karanîn.
- Her wiha dîsa vê xebatê de bi awayê çîrok çîrok jî zêde bûna ‘E’ yê berbiçav ve. Her sê çîrokan de jî herî zêde ‘E’ hatiye bi kar anîn. Di çîroka Dianas de herî kêr ‘C’, di ya Mîrza Miheme de ‘C’ û di ya Keçeluk de ‘Q’ hatiye bi karanîn
- ‘E’ bi giştî û bêistisna herî zêde hatiye bi karanîn lê serê peyvan de karanîna wê asayî ye. Ne tîpa herî zêde ye.
- ‘R’ serê peyvan de her dem girover hatiye bi karanîn.
- P,Ç,T,K jî dawîya peyvan de bi piranî bikirp in.
- Bi awayê giştî di tîpên bikirp de tenê ‘T’, ‘P’ û ‘K’ yê de hejmar û rêjeya bikirpan yêr bêkirp zêdetir in.( bnr. g. 2.2.6. )
- Di vê grafîkê de tiştê ku balê dikişîne; her çiqas heşt heb tîpên bideng bist û sê heb tîpên bêdengbi jî rêje û hejmara bi karanîna bidengan nezî bêdengaye.
- Rêjeya bikirpan ( 3655 ) di navbikirp û bêkirpan ( 16624 ) de ji % 18 û di nav tevahî (42778) tîpan de jî ji % 7,9 cîh digire.

## **PÊVEK**

### **1. CD**

**a) Tez**

**b) Qeyda deng a çîrokên di metnên xebatê.**

## ÇAVKANÎ

### **Pirtûk**

Bedirxan, Emîr Celadet & Lescot, Roger: Kûrtçe Dilbilgisi ( Kurmancî ), Doz Yayınları, 4. Baskı, İstanbul, 1997

Rizgar, Baran: Uygulamalı Kûrtçe Dersleri/Dersên Kurdî, Lithosphere Printing Cooperative, London, 1993

### **Vebêjerên Çirokan**

Nav û paşnav : Vecîde TALU

Cih û dîroka jidayikbûnê : Sêrt - 1963

Asta perwerdehiyê : Dibistana Seretayî

Navnîşan : Sêrt / Navend

Çavkaniyên wê : Pîrikên wê

Dever : Hedît - Dihê - Sêrt

Mêjûya berhevkerinê : 2006

Nav û paşnavê berhevkar : Süleyman KOÇAK